



Newroz... Sembola pîroz û xala hevbeş û yekbûna Kurdan



Hermn Ehmed
Sernivîskara Rewendê

Ji bilî wan hemû êş û jan û wêrankirin û komkujî û ax şewitandin û malwêrankirinên dijminên kurdan ku li ser kurdan de anîne. Ji bilî wê yekê hezaran sal e hewlên asîmîlekirin û bişaftin û nehiştina nijada Kurdan ji aliyê hemû dagîrkerên Kurdistanê ve, li dîrokê de tê kirin. Her wiha li hinek ji qonaxên tarîtiya dîrokê de bi sedan sal e, armanca mezin û karê yekem ê neyarên kurdan, nehiştina (hesta kurdbûnê) bûye. Ziman û nivîsîna kurdî qedexa bû û sizaya wê mirin bû. Ji bilî wê yekê heta niha ku sedsala bîst û yekê ye, beşa herî zêdeyê axa pîroza Kurdistanê mezin, li bin destên dagîrkerên dijî kurdan da ye. Lê belê bi xweşhaliyê ve, kurd her li ser piya ye, kurd bi ziman û çand û hebûn û hêza berevaniya xwe ve maye.

Gelek ji gelên cihanê hene ku kêmtirê ji kurd û Kurdistanê, karesat û sîtemên dagîrkeriyê li ser wan de hatine. Bi wê mercê dagîrkerên wan gelan, hîç yek ji wan wekî dagîrkerên Kurdistanê dirinde û nemirov û xerab û tawanbar û xwînrej nebûne. Lê belê gelek ji wan gelan jî nekarîne û hinek ji wan zimanê wan, ji bo heta hetayê li nav mirovayetiya da nemane. Hinek ji wan cografya axa wan nemaye. Hinek ji wan her ji aliyê gelên din ve hatine bişaftin, jîl û nişên wan nemaye ku hest bikin ser bi wê neteweyê ne. Dîroka wan tenê wekî tekstek bûye babeta ser rûpelan, yan wekî serpehatiyek behsa ewe tê kirin û lê belê, ne helkeft û boneyên wan, ne zimanê wan, ne cejnên wan, ne bîr û bawerîya wan, ne stranên wan, ne muzîka wan, ne nêrîtên wan, ne çanda wan hîç tiştekî wan nemaye.

Lê belê bi xweşhaliyê ve kurd ne yek ji wan gel û neteweyan e, belkû wekî ku min li destpêkê jî behs kir, ji bilî wan hemû tawanên mezinên ji aliyê dirindetirîn

dagîrkerên dîroka mirovayetiya ve li dijî kurdan hatine encam dan, kurd her maye.

Rast e êş û azarên mezin pê gihîştîye, sîtemên mezin di derbarê wê de hatine kirin, xwîneke zêde jê hatiye rijandin, derbeder bûye, koçber bûye, penaber bûye, lê belê kurd û ziman û çanda wê maye, cejn û helkeft û boneyên wê maye û heta niha girîngiyê pê didin û sal bi sal jî ev girîngî bi mayina xwe û çanda xwe ve zêdetir dibe. Êdî yek ji wan aliyên girîngên çand û bawerî û dîroka kurdan ku hezaran sale bi zîndî maye, cejna Newroz a Kurdan e.

Dibe ku ji aliyê azadbûna axa berfireha Başûrê Kurdistanê ji dagîrkeran û her wiha niv azadbûna Rojavayê Kurdistanê, ji aliyê din ve stûrbûna dîwara sîtemê li beşên dinê Kurdistanê, evan du faktoran roleke xwe ya çalak li geşbûn û pêşketinên cûr û awayên girîngîdana bi cejna Newrozê de hebin. Em dibînin, sal bi sal li ser asta cihanê jî, ev cejn zêdetir dibê nasnameya kurd û Kurdistanîyên li hemû dinyayê da. Sal bi sal Newroz li Başûr û Newroz li Bakûr û Rojhilat û Rojavayê Kurdistanê û li derveyê welat jî mezintir û geştir têne kirin.

Ji ber ku Newroz hem cejna pîroza neteweyî û niştîmanî û kultura hezaran salî ya kurdên Zagrosnişin û xwediyê şaristaniyeka mezin e, hem jî serê sal a kurdî ye. Dibe ku ev hemû bêne zanîn. Lê belê ez hez dikim bi êşkera û zelal bibêjim ku ji bo çî Newroz, ne ku li nav axa Kurdistanê, belkû li nav kurdên derveyê welat da jî heta diçe zêdetir geştir dibe? Ji bo çî li nava wan hemû tevlihevî û gengeşe û şer û kavilkeriya navçeyê da, mirovê kurd her ku li dawîya zivistanê nêzik dibe, êdî cûreyeke dilxweşî û geşbînî û xweşbîniyê neteweyî li xwe digre û êdî zêdetir hez bi dîtina agir dîke û dilxweş dibe û hez bi deşt û çiya û xwezayê dîke û li bendê ye û çaverêye roja 20 ê adarê bê heta agir bike şahî û sema û govend û seyranan da

be? Bi raya min, çend sedemên gelek girîng hene ku bûne faktoreke zelal û bihêz û ji bo berdewamiya newrozê û pêşketina newrozê ku mebesta min li wan cîhên sergotara vê kovara şîrîn da û li vê meha pîroz û xweşik ya kurdan da balê bikşînim ser ku li van xalên xwarê da kûrt dikim: Yekem: Kûrî û dêrîniya ra û rîşeya cejna Newrozê ya di nava çand û dîroka hezaran salî ya kurd û Kurdistanê da.

Duyem: Pîroziya agir li nava mîtolojiya kurdan û olên kevnarên kurdan de, ji wê dema ku agir yekemîn û serekîtirîn sembola Newrozê ye. Sêyem: Zîrekî û

hûrî û rijdî û aqilmendiya ew kesê ku yekemîn car, salnameya kurdî danî û bi damezrandina dewlet yan Împaratoriya Med ya Kurdan û li roja Newrozê ve jî girêda. Bi daxwaza lêborînê ve nizanîm ew kî ye, lê belê her kesek bê, gora wî ronak û ruhê wî şad û aram bê.

Çarem: Ji hemû fakteran girîngtir ewe ye ku kurdên her çar beşên Kurdistanê mezin û kurdên hemû dinya yê jî, li ser cejna Newrozê kokî û hevra ne. Wate kurd li her cîheke dinyayê be, Newrozê bi cejna xwe ya neteweyî û dîrokî dizanê.

Êdî aheng û şahiyê ji bo wê bike yan na, ewe girîng nîne, girîng ewe ye bawerî bi wê yekê heye ku wekî Pîremêrd ê şairê mezinê kurd dibêje: (Newroz cejneke kevin ya Kurdan e). Wate Newroz xala hevbeş ya hemû kurda ne, bi cûdahiya îdeolojiya û girêdanên partîti û navçeyên cografîyan ve. Wate kurdek li Tacîkîstan û kurdek li Lubnan û kurdek li Rûsya û kurdek li Amerîka û kurdek li Almanya û Swêd û kurdek li Xorasan û kurdek li Îsrailê jî be, wekî kurdên her çar beşên Kurdistanê, cejna Newrozê pîroz dîkin. kurdeke misilman be, êdî Şîe be yan Sunne, kurdek Êzdî be, kurdek xerdeştî yan kakeyî yan mîtrayî yan krîstîyan yan cihû an jî be dîn jî be, bi her şewezareke kurdî bi xavî û bivivîse, her wiha eger kurd e û kurdî jî nezanê, her bi girîngî û rêzê ve cejna Newrozê bi cejna neteweyî û niştîmaniya xwe ya herî mezin dizane.


Pêncem: Wekî çawa cejna Newrozê bûye xala hevbeş û li ser rêkeftiyî ya hemû Kurd û Kurdistanîyên li hemû dinya yê ye, wiha jî bûye xala me ya cûdaker ya ji gelên din. Ji ber ku gelên din jî cejn û helkeft û bone û pîrozî û sembolên xwe heye û me jî Newroza xwe heye.

Şeşem: Xala dawî ewe ye, madem dijmin û dagîrkerên axa kurdan, madem nepak û xwefiroş û bi eqil dagîrkeriyên li nav me, wan pê nexweşe girîngiyê bi cejna Newrozê bidîn û bi pîrozî lê temaşe bikin, ku wate divê em hemû bizanîn ku girîngîdana bi cejna Newrozê, yek ji wan rêyane ku me li serbixweyî û azadiya yek carekî û serweriya neteweyî û niştîmanî nêzik dîke.

Cejna Newrozê û serê sala kurdî li hemû kurd û Kurdistanîyan pîroz be.

Serfiraz be gelê Kurdistanê, serkeftî be Kurdistanê me ya xweşdivî, her serbilind be ala me ya bilind û rengîn... ■

Naverok



Suna Alan
Yek ji jinên kurd ên serkeftî li
Brîtanyayê

44

6-11
Dîplomasiya Kurdistanê li korbendên
Dubeyî û Davosê

12-15
Kirmanckî (Zazakî) de yew gama girîng û
ereymendeye: Zazano

16-20
Em ê bibin hêza ajotinê ji bo
dîtina çareseriyên siyasî

22-23
Lîrîka Berbangê ya Mewlûd
Oguz çap û belav bû

24-29
EM MECBÛRÎ TIFAQA NETEWÎ NE

30-33
Çekdanîna PKKê di berjevendiya
hemû kurdan de ye!

34-35
Du pêlewanên kurd li Ûkraynayê bûn
yekem û duyem

36-39
Bûbê Eser: Rêbaz xwe nasîn e

40-43
Zubêr Salih: Sebah el-xeyr
bûye nasname ji min re

44-45
Yek ji jinên kurd ên serkeftî
li Brîtanyayê: Suna Alan

46-49
Pêraxistinekê ji pirtûka Evînhebûn e
û hebûn zanîn e

50-53
Nameyeke dîrokî ya Mistefa Barzanî ji John F.
Kennedy Serokê Amerîka re

54-57
Hez dikim aliyekî neteweyî bibe xwediye
pirtûkxaneya min

58-59
Kurd im

Xwedanê imtiyazê
Konfederasyona Revenda Kurdistanî

www.rewend.org
contact@rewend.org

Sernivîser
Harmn Ehmed
harmen@rewend.org

Pêwendî
Hewraman Elî Tewfîq
hawraman@rewend.org

Dîzayn
Aras Akram

Desteya nivîseran
Harman Khalid
Mevlüt Oğuz

DÎPLOMASIYA KURDISTANÊ LI KORBENDÊN DUBEYÎ Û DAVOSÊ



Rençber Bawanî
Mîrhac Mistefa

Pîştî serhildan û raperîna 1991ê ya Başûrê Kurdistanê, Parlamentoya Kurdistanê û Hikûmeta Herêma Kurdistanê hate sazkirin û dîplomasiya Hikûmeta Kurdistanê destpê kir. Niha gihîştîye qonaxeke ku Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê di nava heftiyeke de û li dû bajarên girîngên cihanî yê wekî Dubeyî û Davosê de zêdetirê 60 serok û serokwezîr û berpirs û nûnerên biyanî re civînan encam dide. Eve jî nîşana asta bilindbûna dîplomasiya kurd û Kurdistanê ye ku li van salên dawî de gihîştîye qonaxeke bilind. Lûtkeya Cihanî ya Hikûmetan li Dubeyî 12-14.02.2025an bi beşdariya Mesrûr Barzanî, Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê û 25 serok û serkirdeyên welatên Rojhilata Navîn û cihanê, şandeyên 85 rêxistinên navdewletî, 300 wezîran û 120 şandên hikûmetan pêk hat. Di nava vê lûtkeyê de pêşketinên aborî, reformên hikûmetan, hevbeşîya enerjîyê û pêşketinên çandî û hunerî hatin guftûgo kirin.

Kurdistan li lûtkeya hikûmetên cihanî ya li Dubeyî de

Salane lûtkeya hikûmetan, rêxistinên navdewletî, serkirdeyên welatan û serkirdeyên kerta taybet yê li seranserê cihanê li Dubeyî dicivin.

Serokê Hikûmetê jî bo pêşxistina peywendiyên dîplomasî û aboriyên di navbera Herêma Kurdistanê û



WORLD
ECONOMIC
FORUM

welatên cihanî beşdarî van civînan bû. Di vê çarçoveyê de bi çendîn serokdewlet û serokwezîr û berpîrsên pile bilindên navdewletî re hevdîtinan encam da. Armanca van hevdîtinan bi destxistina derfetên nû yê hevkarîyên bazirganî, veberhênan, aborî û çareserkirina pêşhatên serekiyên navçeyî û navdewletî de bûn.

Her wiha li çarçoveya bernameya vê lutkeyê da, Serokê Hikûmetê beşdariya paneleke taybet ya bi navê “geştkirina li ser gefan, himbêz girtina derfetan” pêşkêş kir.

Giştî yê Encumena Alikariya Kendavê û Serokê Banka Ewropa ya Avadankirin û Geşepêdanê civiya. Peymanek di navbera Kurdistan û Îmaratê de hate îmzekirin.

Kurdistan: Korbenda Aborî ya Cihanî ya li Davosê

Her sal biryarderên bilindên navdewletî yê ji hikûmetan û bazirgan û rêxistinên civaka medenî li bajarê Davos ya Swîsreyê, ji bo Korbenda (Forum) Aborî ya Cihanî (WEF) dicivin.

Îsal li 55. Korbenda Aborî ya Cihanî 2025 an de,



Her wiha Mesrûr Barzanî ji aliyê Mihemed Bin Zayd Al Nehyan Serokê Îmaratê ve hate pêşwazî kirin. Her du alî tekezî li ser girîngiya bihêzkirina alikariya du alî û zêdetir bilindkirina peywendiyên dostaneya di navbera Kurdistan û Îmaratê de kirin.

Ji bilî wê yekê ku serkirdeyên dinê Îmaratê û kesayetiyên siyasîyên navçeyê re jî civiya. Wekî Şahzadeyê Cihnişînê Dubeyî, Cîgirê Serokwezîrê Îmaratê, Wezîrê Berevaniya Îmaratê, her wiha bi Wezîrên Tendirustî, Veberhênan, Navxwe, Emîndarê

ji 130 welatên cûda karsaz û bazirgan, siyasetmedar, akademîsyen û nûnerên saziyên civaka medenî jî di nav de 3 hezar kes beşdarî lûtkeyê bûn û 60 serokdewlet û serokwezîran jî ji beşdaran re axivîn.

Îsal bi navê babeta "hevkarî di serdema zîrek de" civiyan ku tê de balkişandî li ser babetên wekî dúbare avakirina baweriyê, xeyalkirina geşbûnê, parastina gerdûnê, pîşesazî li serdema zîrek de û veberhênanên mirovî.



Mesrûr Barzanî Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê û şandeke pêre ji berpirs û veberhênerên Kurdistanê pêk hatibûn, beşdarbûn. Mesrûr Barzanî bi armanca bilindkirina asta peywendiyên bi giştî û bazirganî û veberhênerana li Kurdistanê de, di astên bilind de hevdîtinan encam da.


Vekirina Mala Kurdistan

li Davosê Serokê Hikûmetê, bi boneya vekirina Mala Kurdistan li Davosê, bi beşdariya Ebdullatif Reşîd Serokomarê Iraqê, berpirsên bilind, karsaz û akademisyenan vekir. Tê da dîmenên taybet bi

guftûgo û hevdîtin û civînên maseya bazinî kir ku rê bi veberhênerên navxweyî û navdewletî da vekir ku dûvdaçûnê li hevbeşiyên xwe yê paşerojê da bikin.

Siyaseta navçeyê û aborî

Di Korbenda Aborî ya Cihanî ya Davos 2025 de, Mesrûr Barzanî, di sê rojan de bi giştî zêdetirê 31 hevdîtinên girîng bi serokên dewletan, serokwezîr û berpirsên bilind yê welatên cihanê re pêk anî. Hevdîtin di warê siyaseta navçeyê, aborî, bazirganî û pêşxistina veberhênerana li Kurdistanê de bûn.



Herêma Kurdistan û Iraqê, balkişandina ser derfetên veberhêneranê û pêşvebirina guftûgoyên li ser geşbûna aboriyê hatin nîşandan.

Mesrûr Barzanî Serokê Hikûmetê got: “Ez dilxweş im, ev e duyemîn sal e, Mala Kurdistanê beşdariya Korbenda Aborî ya Cihanî li Davosê de dike. Hêvîdar im ji bo geşepêdana aboriyê Kurdistan bibe pireke Iraq û navçeyê”.

Mala Kurdistan li Davosê ji bo peşkirandina cihê xwe ya wekî navendeke diyalogên veberhêneranê, dîplomasiyê û aboriyê de kar dike. Li wir mîhvandariya çendîn

Di hevdîtinên cûda bi serokên dewletan û berpirsên bilindên hikûmetên li seranserê cihanê de, Mesrûr Barzanî behsa pêşhatên navçeyê yê piştî rûxana rejîma Esed li Suriye û rewşa wan pêşketinên herêmê da kir. Amadehiya Herêma Kurdistanê dûpat kir ku roleke çalak li destberkirina aramî ya navçeyê de bibîne. Her wiha veberhêneranê biyanî çawa dikarin raste rast sûtê ji hevbeşiya her du veberhêneran bibînin û sûtê bi Kurdistanê jî bigihînin. Ji bilî wê yekê balkişand li ser şiyandên veberhênerana Kurdistanê û bi giştî dîmena aboriya Kurdistanê pêşkêş kir.

Lîsteya civînên Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê

li Davosê Lîsteya wan serokdewlet û berpirsên hikûmî yê cihanî ku li çarçoveya 55. Korbenda Aborî ya Cihanî ya li Davosê de, bi Serokê Hikûmetê re civiyan:

Ebdullatif Reşîd, Serokomarê Iraqê Alexander de Crowe, Serokwezîrê Belçikayê Andrzej Plenkovic, Serokwezîrê Hirwatîstanê (Croatia) Antonio Guterres, Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekgirtî (UN) Dick Schuff, Serokwezîrê Holandayê Hisên Bin Abdulla, Şahzadeyê Cihnişînê Urdinê Îlham Aliyev, Serokê Azerbaycanê Şêx Mihemed Bin Abdurrahman El Sanî, Serokwezîr û Wezîrê Derveyê Qeterê Esed Hesen El Şeybanî, Wezîrê Derve yê Sûriye Edward Heger,

û Birêveberê Birêvebirina Herêma GCC, DP World Anant Maheshwari, Serok û Birêveberê Bicîhkarê Herêmên Cihanî, Honeywell Bedir Cefer, Birêveberê Bicîhkarê Kompanya Crescent Enterprises Jared Cohen, Serokê Karubarê Cihanî, Goldman Sachs Jürgen Rigtterink, Cîgirê Yekemê Serokê Banka Ewrûpî ya Avadankirin û Geşepêdanê Xalîd Mihemed El Zubey, Serokê Kompanya Ominvest Ling Hai Serokê Asyaya Zeryaya Aram, Ewrûpa, Rojhilata Navîn û Efrîqa, MasterCard

Nick Studer, Birêveberê Bicîhkarê Kompanya Oliver Wyman Peter Orszag, Birêveberê Bicîhkar û Serokê



Serokwezîrê berê yê Silovakya Jan Lipavsky, Wezîrê Derveyê Komara Çek Jean Noel Barot, Wezîrê Ewrûpa û Karubarê Derveyê Fransa Xalîd El Faleh, Wezîrê Veberhênerana Suudiye Macîd Bin Abdulla El Qesabî, Wezîrê Bazirganiya Suudiye Mihemmed Cewad Zerîf, Cîgirê Serokomar yê Karubarê Stratejîkê Komara Îslamiya Îranê Mihemed El Cêrgawî, Wezîrê Karubarê Kabîneya Îmaratê Eyderus El Zubeydî Cîgirê, Serokê Encumena Serkirdayetiya Serokayetiya Yemenê Şanda Behreyn bi Serokayetiya Şêx Îsa Bin Selman Bin Hemed El Xelîfe John Kerry, Wezîrê berê yê Derveyê Amerîkayê Mark Jost, Endamê Encumena Niştîmaniya Swîsreyê Abdulla Bin Damîtan, Birêveberê Bicîhkar

Grupa Lazard Richard Hall, Birêveberê Bicîhkarê Kompanya Dana Gas Şemşîr Vayalî, Damezirêner û Serokê Kompanya Burjil Holdings.

Beşdariya Herêma Kurdistanê li rêxistina WEF û Korbenda Aborî ya Cihanî ya li Davosê de, rola wê ya li guftûgoya aborî û siyasî ya navdewletî de bihêztir kiriye. Li rêya van peywendiyên bi serkirdayên cihanê, berpirsên hikûmet û veberhênerên cihanî re, Kurdistanê kiriye lehengeke serekî. Li warê aramiya navçeyê û geşkirina aboriyê de, li paşerojê de ji bo xwe roleke bihêztir bi cih kiriye. ■

KIRMANCKÎ (ZAZAKÎ) DE YEW GAMA GIRÎNG Û EREYMENDEYE ZAZANO



Mutlu Can

Nivîskar (Nûştex)
Stenbol (Îstanbul)

Teknolojî qaso ke ma nêşkenê xo adapteyê ci bikerê aver şono. Hem zî bi goreyê dades-vîst serran ra verî hîna leze aver şono. Bi taybetî zî teknolojiyê zanayîş û agahdarî (înfomatîkî). La bêrê dîyar ke ma kurdî xeyrjê çend îstîsnayan wayîrê wasitayanê awankerdiş û averberdişî yê nê teknolojiyan nîyê.

La no nêno a mana ke ma şert û mercanê teknolojiyan yê hemdemî (modernî) ra îstîfade nêkenê.


Nînan ra yew nimûne ya ke êdî çimê ma de zaf alalade asena aplikasyon o. Tîya de qesdê mi aplikasyonê ke xebitnayoxê telefonanê mobîlan înan anê war û ci ra îstîfade kenê yê. Ziwananê dinya yê serekeyan de beno ke bi seyan tewirê (bêjê) aplikasyonî est ê. Eke ma Kurdîstanê Federalî yê Îraqî bidê teber, ez vana qey mumkin nîyaseno ke ma vajê se (sed) teneyî aplikasyonê bi kurdî (kurmançî, kirmanckî/zazakî, sorankî) est ê û aktîf ê. Oxro ke tena seba her lehçeyî (dîyalektî) bile ganî bi desan aplikasyonê gramerî, ferhengê vateyê verênan, îdyoman ûsn. est bibîyêne. Seba zaf kêmaneyanê kurdan merdim eşkeno vajo, la ez do nika na çarçewa de vaja: “Kanê aplikasyonî, bimrim heval.”

Helbet ke ez hende pesîmîst nîya, eksê ci ameyeyî

ra hêvîdar a. Eke hêzê ma yo ekonomîk est bo, eke ma kadroyanê ehîlan biresnê û înan ra taximan ronê, ma zî goreyê xo eşkenê projeyanê faydedaran amade bikerê û pêşkêşê şarê xo bikerê. Tabî ganî ma hetêkê xo yê zeîfî zî hel bikerê, o çi yo? Ganî ma kulturê xo yê xebitîyayîşê hemparî (muşterekî) geş bikerê. Babeta mina na hûmare yew projeyo ke resa encam û nika sey yew fêkîyî (meyweyî) ke o darêke ra deresayo, verê destanê şarê ma de yo. Ya, ez do behsê nê fêkî yanî behsê Zazanoyî bikera. Hetê bînî ra mi gore hewce est bî ke ez Zazanoyî ser o binusa. Çünke kirmanckî de bê keyepelê zazakînewsî tu cayî de derheqê Zazanoyî de yew xebere, nuşte yan dayîşşinasnayîş nîyame weşanayene. Coka fonksîyonê arşivkî yê nuşteyî zî do est o.

ZAZANO çî yo?

Senî ke fotografan ra zî dîyar beno Zazano yew aplikasyonê ferhengî yê kirmanckî (zazakî) yo ke xebata ey çend aşman ra ver qedîyaye. Eke ez hîna zelal vaja Zazano sereyê aşma desine (10.) ya serra 2024î ra nata aktîf o, yanî xizmetê kurdanê zazayan de yo. Aplikasyon vana la eslê ci de hem keyepel o hem zî aplikasyon o Zazano. Ancîna eslê ci de 2 ferheng ê. Nê di ferhengî ke bingeyê Zazanoyî teşkil kenê, Ferhengê Tirkî-Zazakî û Zazakî-Tirkî yê ke ê hetê Grûba Xebate ya Vateyî ra ameyê amadekerdiş. Seke êno zanayîş na grûbê semedê standardîzekerdişê lehçeya zazakî serra 1996 de Swêd de ronîyaya û xebata aye bi serran o ke dewam kena. No mîyan de na reya diyin a ke ez derheqê Zazanoyî de nusena. Tewr verî zazakînewsî mi reyde bi hawayo nuşteki roportaj kerdbî. Mi uca de zî vatbî, wa tîya de zî sey qeydî ca bigîro. Seba ke ferhengê Grûba Vateyî bêrê gurenayîş nameyê Grûbe ser o, M. Malmîsanijî ra destûr bi wasitaya mi ame girewtîş. Bêguman na xebate zî sey yê na Grûbe Zazakî rê faydedar biyayene xo rê esas girewt.





Hikayeya Zazanoî Hema-hema ke yew serre bî ke mi o nas kerd. Nameyê ey Orhan Kaya yo. Qezaya Dêrsimî Xozat ra yo.

Emrê ey 50î ra tayê berz o û panc serrîya xo ra nata Hollanda de ciwîyeno. Ziwan û kulturê xo rê hesas o. Rojêke ma medyaya sosyalî ser ro soxbet kerdêne. Qisey ame ferhenganê dijîitalan ser. Mi ra persa va: Gelo qet şekilê aplîkasyonî de yew aplîkasyonê kirmanckî est o? Mi wina cewab da: Ney, çî heyf ke çin o. Esas epey verî ame aqilê mi, mi va dê beno nêbeno, kam zano çiqas pere girêdano... Va mamosta ti na mesela ser o tayê cigêrayîş bike. Ez wazena mesrefî bigîra xo ser. Mi zî winî kerd, axir sereyê ma bî zelal û ma karê viraştina programê Aplîkasyonî da yew kurdê ciwanî. Nameyê ey Mesut o. O bi xo Kurmanc (Kirdas) o. Program qedîya, proseduranê Google û AppStorî ra pey seke mi va Zazano dest bi fealiyetê xo kerd.

Derheqê Zazanoî de Çend Agahiye Spesîfikî Lînkê Zazano cêr ra nusîyaye yo. Kurdê kirmanckî (zazayî), kurdê bînî ke kirmanckî bala înan ancena, reyna kesê bîyanî (xerîbî) ke wazenê kirmanckî bimusê yan zî kirmanckîya xo aver bêrê eşkenê bitikne û keyepelî ra îstîfade bikerê. Seke mi cor ra zî va kes eşkeno Google Play û AppStore ra Zazanoî bîyaro war û 24 saetî telefonê xo yê destan/mobilî de ey bixebitno. Belaş o, ne aboneyîye ne sînor ne zî formalîte. Goreyê averşiyayîşê muhtewaya Ferhenganê Grûba Vateyî û vurîyayîşanê teknîkan gama ke îcab bikero, keyepel û aplîkasyon do hetê ma ra bêrê aktualîze kerdene. Taybetmendîyê Zazanoî çî-çî yê? Çira nameyê xo Zazano yo? û cewabê nê tewir persan keyepel/aplîkasyonî de ênê dayene.

Aye ra ez hîna zêde derg nêkera û nuştayê xo rê wina nuqta rona: Ez hem sey koordînatore ci hem zî sey yew kurdê zazayî sponsor Orhan Kaya, muhendîsê çîynermî Mesut Bîlîr û edîtor Sezgîn Firatî rê sipas kena. Ez zana ke no tena yew destpêk bî, hêvîdar a ke ma do ameyeyî de bi nameyê Zazanoî mijdayane (mizgînîyanê) neweyan biderê şarê xo.

zazano.org ■

EM Ê BIBIN HÊZA AJOTINÊ JI BO DÎTINA ÇARESERYÊN SIYASÎ



Najah Hevo
Parêzer, Almanya

Seroka Yekîtiya Jinên Kurd li Sûriyê - Rodos, û Seroka Nûnertiya Ewropî ya Encûmena Kurdî li Sûriyê Nejah Hevo, derbarê rewşa siyasî li Sûriyê, hêzên herêmî û navdewletî û rola jinên kurd di piroseya aşti û çareseriyê de û çendîn mijarên din de ji Kovara Rewendê re nixandineke berfireh kir. Xanim Hevo diyar dike ku Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Suriyê (ENKS) hewl dide ku rola kurdan di prosesa siyasî ya Sûriyê de bilind bike, bi daxwaza mafên kurdan Encûmen dê hewl bide ku mafên kurdan weke pêkhateyeke bingehîn li Sûriyê erê bike, “ siyasatmedarên jin ên kurd wê bibin hêza ajotinê ji bo dîtina çareseriyên siyasî yên ku mafên jinan û mafên gelê kurd”.

Pîştî rûxana rejîma Sûriyê û reva serokê rijêma Sûriyê Beşar Esed, Sûriyê derbasî qonaxeke siyasî ya nû bû li welatekî ku di asta civakî, aborî û ewlehiyê de westiyaye, û bi nebûna hemû şêwe û şêwaza dewletê, bi berdewamiya êşên mirovî ve girêdayî bi du tiştên bingehîn ve girêdayî ye, ev in: Dosyaya girtiyên ku stûna sereke ya guhertina Sûriyê bû û hîna jî heye, û ya duyem jî dosyaya penaberên li derve û awareyên navxweyî, yê ku bijardeyên wan kêm in ji ber wêrankirina berbelav ku rejîmê li pey xwe hişt bi çûna xwe û reva ji nişka

ve ji her kesî, ku kartên siyasî û hevbendiyên nû li herêmê ji nû ve rêz kirin, ku bi ti awayî nedihatî hêvîkirin.

Rewşa kurdan, bi taybetî em di çarçoveya Encûmena Niştîmanî ya Kurdî (ENKS) de, em ji çend aliyan ve bi hevsengiya leşkerî û siyasî dinirxînin; Eger Heyet Tehrîr El-Şam (HTŞ) li herêmê serdest be, dibe ku helwestên Kurdan ber bi dîtina hinek lihevkerin û têgihiştinê bi vê fraksyonê re bimeşin, lê belê eger Heyet Tehrîr El-Şam bi siyaseta wan ve girêdayî be helwestên ku li dijî mafên kurdan bin an jî daxwaza rakirina hebûna wan a siyasî bike dê bibe sedema nakokiya li ser maf û azadiyan.

Di derbarê pîrsa mafên Kurdan de; Eger eniyê gotareke ku mafên siyasî û çandî yê kurdan red dike berdewam bike, dê di paşerojê de ihtimaleke mezin rû bide pevçûneke siyasî yan jî leşkerî, ji ber ku Encûmena Niştîmanî ya Kurdî daxwaza parastina mafên kurdan dike. Ziman, perwerde, çand û heta di çarçeweya navendiya pîralî ya yekbûyî de xwe bi rê ve dibe.

Derbarê rola hêzên herêmî li Sûriyê; Têkiliya hêzên herêmî yê wekî Tirkîye, Iraq û Îranê bi rewşa Sûriyeyê re jî wê bibe faktoreke bi bandor. Weke mînak, eger zextek ji aliyê Tirkîyê ve li dijî kurdan, yan jî ji aliyê Îranê ve yan jî ji welatên din hebe, dibe ku meyla siyasî ya Encûmena Kurdî li gorî daneyên herêmî biguhere



û helwestên siyasî werbigire û ligel rêkeftina ligel rêkeftinekê ligel hevberdiyên nû yên stratejîk ava bike. opozisyona sûrî, ku nasnameya wê ya siyasî dikare ji nû ve li ser bingeha guhêrbarekî niha bête guherandin, tevî cudahiya di dîtanê de, dibe ku Encûmena Niştîmanî ya Kurdî hewl bide danûstandinê ligel aliyên din ên opozîsyonê bike da ku bigihîje çareseriyêke siyasî ku mafên Kurdan di nav her yek de garantî bike.

çareseriyê pêşerojê, û xala bingehîn kêşeyên navxweyî ye; Dibe ku kêşeyên navxweyî di nava refên kurdî bi xwe de derbikevin û li vir mebesta min Encûmena Niştîmanî ya Kurdî û Partiya Yekîtiya Demokrat û proseya danûstandinê di navbera wan de û pêkanîna şandeke hevbeş a kurdî ye.

Helwesta Encûmena Niştîmanî ya Kurdî piştî rûxandîna û rûxandina rêjîmê li Sûriyê girêdayî çend faktorên girêdayî guhertinên siyasî yên paşerojê li welat e. Encûmena Niştîmanî ya Kurdî hewl dide ku rola Kurdan di prosa siyasî ya Sûriyê de bilind bike, bi daxwaza mafên kurdan Encûmenê hewl bide ku mafên Kurdan weke pêkhatîyêke bingehîn li Sûriyê erê bike, û daxwazên wan bi dest bixe. mafên wan, di çarçeweya yekrêziya welat de, li gora ku Encûmenê daxwaz dike ku bi riya nûnertiya siyasî û rewşa civakî-aborî ya Kurdan li Sûriyê, û beşdariya di proseya siyasî de, Encûmenê dilgiran e ku bibe beşek ji wan. Her proseya siyasî ya paşerojê piştî rûxandina rêjîmê, di heman demê de tekezî li ser pêwîstiya beşdarbûna hemû aliyan di avakirina dewleta Sûriyê ya paşerojê de kir. Encûmenê bê guman daxwaz dike ku Kurd di danûstandinê paşerojê de ku mafên wan di çarçeweya dewleteke pîralî ya demokratîk de garantî dikin, bîn temsîlkirin, ji bilî parastina aramiyê li herêmên Kurdî piştî rûxandina rejîmê, tê çaverêkirin ku Encûmena Niştîmanî ya Kurdî dê hewl bide ku ewlehî û aramiyê li navçeyên kurdî dabîn bike, bi rêya bihêzkirina saziyên xwe yên herêmî û xurtkirina hemahengiyê ligel hêzên din ên siyasî yên kurdî li herêmê ji bo ku qeyranên navxweyî yan jî bandorên destwerdanê derve zêde nebin.

Balkişandina li ser xala birêvebirina cihêrengiya etnikî û mezhebî gelekî girîng e ku Encûmena Niştîmanî ya Kurdî wê baweriyê de ye ku divê mafên hemû pêkhatîyên Sûriyê di dema rûxandina rêjîmê de bêne garantîkirin, bi karkirina ji bo pêşxistina pêkvejiyana aştîyane di navbera pêkhatîyên Sûriyê de wek ereb, kurd, xiristîyan û aşûrî ji bilî mezhebê din. Her weha, bi naskirina navdewletî, Encûmena Niştîmanî ya Kurdî hewl dide ku naskirin û piştewaniya navdewletî ji welatên sereke û rêxistinên navdewletî werbigire, ji bo bidestxistina armancên xwe yên siyasî û dabînkirina

mafên gelê kurd li Sûriyê di nav sistemeke demokratîk de ku nasnameya neteweyî û siyasî nas bike. Mafên hemû pêkhatîyan, ji ber vê yekê, Encûmena Niştîmanî ya Kurdî dê bi awayekî çalak di avakirina pêşeroja Sûriyê de, bi giranî li ser dabînkirina mafên Kurdan û beşdariya di avakirina dewleteke demokratîk û büstîkrar de.

Piştî çûna rêjîma Esed, şeklê destûra Sûriyê ya paşerojê dê girêdayî hevseriya hêza siyasî li welat û cewherê rêkeftinê ku dê di navbera hêzên siyasî û civakî yên cuda de bêne kirin. Tê çaverêkirin ku di derbarê nasnameya siyasî ya Sûriyê de çendîn bijarde û gotûbêj bîn kirin, ji wan: Destûra laîk: Beşek mezin ji hêzên opozîsyonê, di nav de Encûmena Niştîmanî ya Kurdî û hêzên din ên azadîxwaz û laîk, dikarin hewl bidin ku destûreke laîk ava bikin ku tekezî li ser cihêbûna ol û dewletê dike û mafên hemû welatiyan bê çî ol û mezheb garantî dike. Ev vebijarkê dê hewl bide ku garantiyan ji bo kêmbûnê olî û etnikî peyda bike, mafên jinan û wekheviya li pêşberî yasayê dabîn bike, û karekterên sîvil ya dewleta Sûriyê ya paşerojê nîşan bide.

Destûra Bingehîn a Îslamî: Ji aliyê din ve, hin hêzên siyasî yên xwedî meyla îslamî, wek opozisyona sunî an komên din ên îslamî, dibe ku hewl bidin ku hin prensîbên ku ji qanûnên îslamî hatine îlhama xwe di destûrê de bicîh bikin. Lê belê, tê çaverêkirin ku ev hêz di rewşek veguhezînek siyasî ya berfireh de nermtir bin, ji ber ku proseya danûstandinê hewceyê peydakirina çareseriyên ku di navbera olî û medenî de hevseriyê bike.

Destûreke berfireh û lihevhatî: Li gorî pêkhatina tevlihev û cihêreng a civaka Sûriyê, ihtîmal e ku destûreke lihevhatî li ser were xebitandin ku prensîbên laîk û yên ku ji çanda îslamî hatine îlhamakirin di çarçeweya dewleteke demokratîk de li hev bikin. Ev destûrê dê hewl bide ku mafên hemû mezheb û pêkhatîyên Sûriyê (sunnî, şîe, xiristîyan, kurd, durzî û yên din) li ber çav bigire, mafên kêmbetewan garantî bike, û bingehên azadiyên takekesî û mafên mirovan deyne.

Destûra federal yan nenavendî: Eger proseya siyasî serkeftî be, dibe ku daxwaza destûrekê were kirin ku destûrê bide sistemeke federal an nenavendî, nemaze li deverên ku kêmbûnê mezin hene wek deverên kurd, elewî û durzî. Dibe ku ev makezagon di navbera hikûmeta navendî û rêveberiyên herêmî de bi asteke otonomî dabeşkirina desthilatan bigre nav xwe. Di dawiyê de, şeweya destûra Sûriyê piştî derketina rejîmê girêdayî lihevhatin û lihevhatinên ku dê di navbera hêzên siyasî yên cuda de piştî bidawîbûna aloziyê pêk

werin. Pêwîst e ku destûr du nasnameyan yekcar nîşan bide: Nasnameya niştîmanî ya berferêh ku yekîtiya Sûriyê tekez dike û nasnameya ku mafên olî û çandî yên kêmbetewan di çarçeweya wekhevî û dadperweriyê de garantî bike.

Piştî rûxandina rejîma Esed, tê çaverêkirin ku mafên jinan di destûra nû ya Sûriyê de bibe şahidê pêşketinê girîng ji ber nîqaşên avakirina dewleteke demokratîk a nûjen.

Bi veguhtinê potansiyel ên siyasî ve girêdayî, dibe ku di makezagona nû de komek prensîb û mafên ku rola jinê di civakê de zêde dike û wekheviya tam a li pêşberî qanûnê garantî dike, bigire nav xwe.

bîn girtin.

Beşdarbûn û nûnertiya siyasî: Tê çaverêkirin ku bendên destûrî hebin ku nûnertiya jinan di saziyên siyasî de, wek parlamento û hikûmetê de, misoger dike. Dibe ku di van metnan de kotayek taybetî ji bo jinan di van meqaman de were veqetandin an jî misogerkirina tevlihbûna wan a tevahî di biryarên siyasî de be.

Mafên Aborî û Civakî: Destûra Bingehîn wê hewl bide ku mafê jinê yê bi mûçeya wekhev bixebite û bê cudahî bigihîje derfetên aborî. Mafên jinan ji bo lênerîna tenduristî û civakî, di nav de mafên jidayikbûnê jî dikarin bîn zêdekirin.

Perwerde: Destûra Bingehîn wê mafê jinê yê



Ev dikare di nav de: Wekheviya qanûnî: Di makezagona nû de tê çaverêkirin ku prensîba wekheviya jin û mêr di her warî de, di nav de mafên medenî, siyasî, civakî û aborî de, garantî bike. Ev ê mafê perwerde, kar, tenduristî û beşdariya siyasî di nav xwe de bihewîne, di heman demê de hemû qanûnên ku cudakariyê li jinan dike an mafên wan bisînor dike bê rakirin.

Parastina mafên jinan ji tundûtûjiyê: Di makezagonê de dibe ku qanûnên qanûnî yên qedexekirina şideta li dijî jinan, çî bi şiklekî tundûtûjiya nav malbatê, çî karê organîzekirî wek destdirêjiya seksî yan jî zewaca di temenê biçûk de, bihewîne. Ji bo parastina jinan ji her cure tundiyê û pêşxistina mafê wê yê ewlehiyê dê tedbîr

gihandina perwerdehiya tam û wekhev a bi mêran re misoger bike. Ji bo ku di perwerdehiyê de cihêkarî ji holê rabe û derfetên jinan ji bo xwendina bilind û tevlihbûna di hemû qadên zanistî de bîn zêdekirin, dibe ku xebat bîn kirin.

Ji holê rakirina qanûnên cihêkariyê: Yasayên ku cudakariyê li jinan dikin, yên wek zewac, hevberdan û mîrasê, tê çaverêkirin ku bîn guhertin an rakirin. Jin dikarin di van waran de mafên wekhev bidest bixin û serxwebûna wan a aborî û civakî bi pêş bixin.

Rola jinan di civaka medenî de: Dibe ku destûr bi



zêdekirina rola jinan di civaka sivil û sektora nehkûmî de, bihêle ku ew bi bandor beşdarî çalakîyên civakî, çandî û xêrxwaziyê bibin. Lê belê serkeftina van mafan bi hêza îradeya siyasî û hebûna zextên civaka sivil û jinên ku dixwazin van daxwazan pêk bînin ve girêdayî ye. Destûra nû dê bibe îfadeya lihevhatineke berfireh di navbera hêzên siyasî yê cuda yê Sûriyê de ji bo misogerkirina parastina mafên jinan di pêşerojê de.

Ji ber ku piştî rûxana rejîma Esed destûrek ji bo Sûriyê tê nivîsandin, tê çaverêkirin ku siyasethedarên jin ên kurd roleke sereke bilîzin di dabînkirina nûneratî

û mafên kurdan di destûra nû de, û herwiha bihêzkirina rola jinan di proseya siyasî de. giştî. Tê çaverêkirin ku di çarçeweya Sûriyeya yekgirtî de bandoreke girîng hebe di bidestxistina hevsgengiyê di navbera wekhevîya zayendî û mafên gelê kurd de. Rola potansiyela siyasethedarên jin ên Kurd di çend aliyên de bi kurtî dikare were vegotin:

Nûnertiya kurdan û dabînkirina mafên wan: Siyasetmedarên jin ên kurd dê bibin beşeke sereke di her danûstandinên destûrî de ji bo dabînkirina mafên kurdan di Sûriyeya pêşerojê de. Ew ê hewl bide ku

mafên gelê kurd di makezagonê de cih bigire, di nav de mafê perwerdeya bi zimanê zikmakî, xweserî an desentralîzasyona li herêmên kurdan û zêdekirina temsîliyeta di sazîyên herî bilind ên hikûmetê de.

Bi beşdarbûna xwe, wê hewl bide ku kurd li derveyî ti çareseriyên siyasî yê ku yekitiya Sûriyeyê garantî dikin nemînin.

Pevçûn ji bo mafên wekhev: Siyasetmedarên jin ên kurd wê roleke girîng di pêşxistina wekhevîya zayendî ya di nava civaka kurd de û li Sûriyê bi giştî bilîzin. Ew

ê hewl bide ku di makezagonê de xalên ku cudakariya li ser bingeha zayendî qedexe dike û parastina qanûnî ya li dijî tundîya li ser jinan pêk tîne, bigire. Wê bi çalakîyên xwe, bi taybet qanûnên ku mafên jinên kurd ên siyasî, aborî, civakî garantî dikin, derxîne.

Banga zêdekirina tevlebûna jinên Kurd ên siyasî: Siyasetmedarên jin ên kurd wê bixebitin ku jinên kurd di meclîs û sazîyên cuda yê hikûmetê de bibin xwedî temsîliyeta bi bandor. Dibe ku kotayek ji bo jinan di postên siyasî de teşwîq bike, û ji bo mafê jinên kurd ku di hikûmetê û parlamentoyê de xwedî postên bilind bin.

Tevlî mafên jinan di qanûnên kurdî de: Siyasetmedarên jin ên kurd dê hewil bidin ku zagonên ku rola jinên kurd di civakê de bilind dike, wekî parastina jinan ji şideta nav malê û dabînkirina mafê wê yê mîras, kar û perwerdeyê bixin nav xwe. Her wiha wê hewl bide ku mafê jinên kurd di warê aborî û civakî de li herêmên kurdan were dabînkirin.

Rola jina Kurd di piroseya aştî û çareseriyê de: Jinên siyasî yê kurd piştî rûxandina rejîmê dê roleke mezin di piroseya aştî û lihevhatina netewî de bilîzin. Bi rola xwe ya di meclîsên siyasî de, wê ji bo berjewendiyên jinên ku ji pevçûnan bandor bûne, biparêze û di pêvajoyên lihevhatinê û dadweriya veguhêz ên piştî pevçûnan de temsîliyeta jinan misoger bike.

Bihêzkirina nasnameya kurdî di nav dewleta Sûriyê de: Siyasetmedarên jin ên kurd dikarin beşdarî peşxistina nasnameya çandî û siyasî ya gelê kurd li Sûriyê bibin, di nav de parastina ziman û çanda kurdî. Hûn ê bibin beşek ji diyalogê ji bo ku destûra nû cihêrengiya civaka Sûriyê nîşan bide, di nav de nasnameya mafên çandî û siyasî yê kurdan.

Beşdariya civaka sivil: Siyasetmedarên jin ên kurd ji dê ji bo pêşxistina rola jinan di civaka sivil de li ser asta herêmî û navneteweyî, bi avakirina sazîyên sivil ên ku mafên jinên kurd di çarçova cuda de diparêzin, çî di warê perwerde, tenduristî, an kar.

Hevahengiya bi hêzên siyasî yê din re: Siyasetmedarên jin ên kurd dê hewl bidin ku bi hêzên siyasî yê din re li Sûriyê hevkarîyê bikin da ku çareseriyên lihevhatî yê ku mafên kurd û jinan garantî dikin, û zêdekirina hevkarîyê di navbera pêkhatiyên cuda de ji bo dabînkirina paşerojê demokratîk û cihêreng. Herî dawî jî siyasethedarên jin ên kurd wê bibin hêza ajotinê ji bo dîtina çareseriyên siyasî yê ku mafên jinan û mafên gelê kurd di çarçoveya Sûriyeyê yekgirtî û demokratîk de hevsgeng dike. ■

LÎRÎKA BERBANGÊ YA MEWLÛD OGUZ ÇAP Û BELAV BÛ



Dîwana helbestkar û rojnameger, Mewlûd Oguz bi navê 'Lîrika Berbangê' bi edîtoriya helbestkar û wergêr Kawa Nemir ji weşanxaneyê Avestayê li Stenbolê derket.



Yek ji nivîskarên herî naskirî û berhemdar ê kurmanciyê li bakur, Berken Bereh derbarê helbesta Oguz de dibêje, “Dema bi hûrgilî û bi baldarî xwe bera hundirê şî’ra Mewlûd Oguz didî tu li vê rastiyê diwerqilî, tu dibî şahidê vê helwesta wî ya ku her bi silavdayîn û ji deynkirina peyvekê pêk tê. Ew bi xwendin û serdana xwe ya li dibistana yê beriya xwe, rist û şî’rên aram bi teql û efsûn lêdike. Wek ku bibêje, dixwazim şî’ra xwe bikime ‘nîzam û întizamê.’ Mewlûd Oguz, bi ferhengeke henûn, dengê aram û nerm û bi hizra xwe ya ku wek şekirê çayê têkelî ristan bûye, mizgîniya şa’îrekî ji me û xweser û resen radigihîne me; bi kêrên porê xwe, lîrika berbangê, bîstanê stêran, şekirsêvekê, berberoya di rukûyê de, lêkereke kesk, hokereke sor, helwesteke pola, desthilata saadetê û hwd. ew hêma û lihevanînên vê rastiyê ne. ‘Lîrika Berbangê’, çi civakî, çi takekesî, rengê coş û peroşîya me ye. Min bi tahm û



zewqeke xweş şî’rên di vê pirtûkê de xwendin. ‘Pêjna lingê şairekî baş’ ji wan tê...”

Mewlûd Oguz kî ye?

Helbestkar, mamosteyê kurdî li zanîngehê, rojnameger û wergerê sondxwarî yê kurdî ye. bi eslê xwe Ji Heskîfa Batmana Bakurê Kurdistanê. Helbestên wî yên ewil di Pêngav, Çirûsk, W, Nûbihar, Bar Helbest û kovarên din de hatine weşandin. Edîtoriya kovara muzîkê ya bi navê Ziryab kiriye. Her wiha wekî edîtor, peyamnêr, wergêr û berpirsiyarê ragihandin û medyayê li çendîn saziyên cuda kar kiriye. Ji 2022yan ve li zanîngeheke taybet li Stenbolê dersên kurdî dide. Û her wiha bi awayekî serbixwe rojnamevanî, edîtorî û tercumanîyê dike. Helbestên wî bo farisî û îtalî hatine wergerandin û weşandin. Lîrika Berbangê dîwana wî ya ewil e.

xweragir

mirov ji bîr dikin, çiya ji ber dikin
wisa dibêje şênîyê dawîn ê tara banî
xemên me hevpar in wan bike şî’r
zêmârên me kesk in wan bike nivîşt
encex wiha em bibin xweragir

lîra bînîştîman ya xwînê,
hewesa bêgem a xwebûnê
em li ku derê giyan ji dest bidin
ew der e navenda gerdûnê

li vir binihêre

demekê misasa stêrkan li vir ketibû
guh bide, çemek ji çivîkan çivan dide xwe
li quntara çiyê, lê digirim, li wê peyva ku
weke hirmîyeke hezîranî li xewna te diale
pûng diqedîne taqetê, tineyî kor dike çavê heyvê
heta ji min hat min pal da bedewiyên spêdeyê
eniya te ya gewez dibe esmanê tîtîyan
bi çarmêrkî rûniştîm li ser betanê şevê
û min hişyar kir ejdehayê gumanê
qerebalixê kitana xwe qetand
her tişt te bibîr tîne, kesr û kerba min a kubar
tê bîra te min çawa kêferat dikir li bin siya hebûnê
dema gurzê meraqê li ser sînga min kon vedida
sadebûna sadiq belav dibû li ser fêza bajêr
lê timayî û endazeyê li hev kirine
dûrî min bin ez bê zar û ziman im
bi ser de jî birînen min gul vedane
bexçê min beyar, ez ji xwe re neyar ■

EM MECBÛRÎ TIFAQA NETEWÎ NE



REWEND

giyanê pakê şehîdên Kurdistanê û sirûda niştimaniya Ey Reqîb kongreyê destpê kir.

Gotar

Gotara konfederasyonê ji aliyê Îsmail Kamil ve hate pêşkêş kirin ku behsa pêşveçûn û yekgirtin û yekxistina federasyonê û komeleyên kurdan kir. Her wiha tekez li ser piştevanî û palîştiya Kurdên li diyasporayê li biryara dîrokiya Serok Barzanî ya li ser encamdana referandûma serbixweyiyê kir. Di dawiyê de hêvî xwest ku Herêma Kurdistanê ber bi pêşve biçê û kongreya paşerojê li Kurdistanê serbixwe be.

Di rojên 07 û 08.12.2024an de Konfederasyona Revenda Kurdistanî, li Berlîna paytexta Almanyayê kongreya xwe duyem bi dirûşma (Yekgirtin serkeftine) saz kir ku tê de destûr û logoya konfederasyonê hate guhertin. Her wiha Komîteya Birêvebiriya li gor kurdên her çar perçeyên Kurdistanê û bi rêjeya du endamên ji bo her perçeyek bi ber çav girtina Kurdaniyên Qefqasya û Yekîtiya Sovyeta berê ku ji bo her yek ji wan endamek hatin destnîşan kirin. Her wiha yekem car e di dîroka partî û rêxistinên Kurdaniyan de, rêjeya jinan di Komîteya Birêvebiriya de bi wekhevîyê hate destnîşan kirin.

Kongreya duyem ya Konfederasyona Revenda Kurdistanî li du rojên rêkefta 07-08.12.2024 bi amadebûna rêzdar Şîfa Barzanî Serpereştyarê Giştî yê Revenda Kurdistanî û nûnerên aliyên siyasî û kesayetiyan siyasî û akademî û rewşenbîrên Kurdistanê û li derve û 300 endaman ve kongre hate saz kirin. Kongre bi nûnerayetiya tevahiya federasyon, komele û rêxistinên Kurdistanî û çendîn çavdêrên Kurdistanî û biyanî birêve çû. Di destpêkê de kurte vîdeoyek ku serkirdeyên Kurdistanê û bajarên Kurdistanê tê de hate nîşandan û paşê bi xulekek rawestan ji bo ruh û

Paşê gotara Serok Mesûd Barzanî ji aliyê Şîfa Barzanî Serpereştyarê Giştî yê Revenda Kurdistanî ve hate xwendin. Di gotarê da behsa hengavên pêkanîna Konfederasyona Revenda Kurdistanî kir û hêvî xwest ku deng û rengên Kurdaniyan bin. Di beşeke din a gotara rêzdar de, balkişand li ser mafê çareya xwenivîsîna gelên cîhanê ku ew mafe ji xelkê Kurdistanê hatiye zeftkirin. Li wê cografyaya ku kurd lê dijîn, înkariya jiyana kurdan tê kirin, lê belê gelê Kurdistanê tu demekê dev ji hewl û têkoşîna xwe bernedaye û her berdewam e û di pêkvejiyana netewe û ol û mezheban de wêneyeke xweşik û serdemiyane pêşkêş kiriye ku li Rojhilata Navîn de wêneyeke dinê wê nîne. Eve ji nîşana wê rastiye ye ku xelkê Kurdistanê aştiyê dixwaze û aştxwaz e û berevaniyê li maf û hebûna xwe û serbixweyiyê dike.

Her wiha dilxweşî û bexteweriya xwe xiste rû ku Kurdaniyên diyasporayê ji bilî bîr û nêrinên xwe yên cûda ve, karîne kongreyeke wiha saz bikin û hemû li bin sêwana konfederasyonê de kom bibin. Daxwaz jî kir ku xizmeta doza rewya ya gelê xwe bikin û Kurdaniyê bikin û partiyetî û hizbayetiye nekin.





"Em hemû ji bo yek armanca bilind kar bikîn, ew jî Kurdistanê û gelê Kurdistanê pêwîstî bi we heye ku nûnerayetiya wê bikin".

Paşê Kendal Nezan Serokê Enstîtûya Kurdî li Parîsê, gotara xwe pêşkêş kir û xweşhaliya xwe derbirî ku beşdariya kongreyêke wiha mezin ya Kurdistanîyên diyasporayê kiriye. Di heman demê de hêviya serkeftin û pêşveçûnê zêdetir ji bo komkirina tevahiya Kurdistanîyan xwest û bal kişand li ser yekbûn û yekgirtina gelê Kurdistanê ya ji bo parastina axa Kurdistanê.

Rêzdar Şîfa Barzanî Serpereştyarê Giştî yê Revenda Kurdistanî, gotarek pêşkêş kir û behsa kongreya yekem ya Konfederasyona Revenda Kurdistanî kir ku sê sal berê bi serpereştî û rênimayî ya Serok Mesûd Barzanî li rojên 4 heta 7 ê 12 ê 2021 li Hewlêra paytexta Herêma Kurdistanê hate saz kirin. Li gor destûrê îro piştî sê salan bi dirûşma „yekgirtin serkeftine“ ku nişana berxwedanî û yekbûne li Berlînê kongreya xwe ya duyem saz dike.

Paşê behsa destbikarbûna rêzdar ya li meha sê ya sala 2023an kir ku wekî Serpereştyarê Giştî yê Revenda Kurdistanî hatiye destnîşan kirin û ji aliyê Serok Barzanî ve rênimayî û karên ji bo ber bi pêşveçûna karên konfederasyonê hatiye raspardin. Rêzdar jî piştî guftûgo û danustandina bîr û ramanên şarezayan û çalakvanan û akademyan plana stratejiya karên xwe xistiye rû ku ji sê deman de destnîşan kiriye. Ew jî demkurt, navend û demdirêj de, ji bo her qonaxek jî demeke destnîşan kiriye. Her wiha nêzîkî 110 civînên ceweriyê li çendîn welatan ji bo komkirina Kurdistanîyan û gûhgirtina daxwaziyên wan encamdane û kariye di demeke diyarkirî da û konfederasyonê ji sê federasyon û çardeh navendan ve ji bo 20 federasyon û çar federasyonên

navdewletî zêde bike. Her wiha 106 komele û civatên Kurdistanî li bin sêwana konfederasyonê de berdewamiyê bi karên xwe didin. Avakirina navendan li bajarên mezin û berfirehbûna Kurdîstaniyan yên li Amerîka, Japonya, Awustralya û Zelanda Nû û hwd.. ku ji niha ve hejmara wan 40 navend e.

Paşê daxwazê ji Kurdîstaniyan kir ku di demên van du rojan de destûreke nû dabirêjin û deng li ser bidin, komîteyeke nû ya birêvebiriye ji bo konfederasyonê hilibijêrin.

Hilweşandina Komîteya Birêvebiriye û pêdana padaştan

Komîteya Birêvebiriye û Komîteya Giştî ya Konfederasyona Revenda Kurdistanî, xwe hilweşandin.

Paşê ji aliyê rêzdar Dilşad Barzanî Nûnerê Hikûmeta Herêma Kurdistanê li Almaniya ve padaşt û spasname pêşkêşî komîteya berê ya birêvebiriya Konfederasyona Revenda Kurdistanî kir. Paşê jî rêzlêgirtina her yek ji Komîteya Giştî ya Konfederasyona Revenda Kurdistanî, Komîteya Şewirmendiyê, Komîteya Çavdêriyê, Komîteya Amadekarê Kongreyê û çend kesayetiyan diyarên li nava konfederasyonê kirin.

Destnîşankirina Komîteya Birêvebiriye û nivîsîna destûrê

Destnîşankirina Komîteya Birêvebiriya Kongreyê ku ji heft endaman pêk dihat, wekî komîteyên (Destûr, Darayî, Lêpîrsîn, Bernameya Paşerojê û Hilbijartin û Xwe berbijêr kirinê).

Paşê tevahiya destûra nû ya konfederasyonê hate xwendin û radestî komîteya destûrê kirin ku pêdaçûnê li ser bike û li dawiyê de bi dengên giştî destûr hate pejirandin.

Xwe berbijêr kirin

Roja duyem, dergehê xwe berbijêr kirin û nasandina kandîd û berbijêrên komîteya birêvebiriye birêve çû ku li proseyeke demokratîk vekirî da 10 kes ji bo komîteya birêvebiriye bi berçavgirtina rêjeya perçeyên Kurdistanê û Kurdîstaniyên niştcihê Ermenîstan û Sibîrya û Yekîtiya Sovyeta berê, her wiha du endamên yedek hatin hilbijartin.

Paşê daxuyaniya bi dawî hatina kongreyê hate xwendin ku konfederasyon wekî rêxistineke navdewletî û Kurdistanî ji niha de ji 40 navend, 106 komele û rêxistin, 20 federasyon û çar federasyonên

navdewletî li xwe digre ku nûnerayetiya hemû pêkhatên gelê Kurdistanê dikin.

Peyama kongreyê

Di peyama dawî ya kongreyê da, kongre bi hemû şiyaneke ve palpiştî û piştewaniya aştiyane li doza



rewaya gelê Kurd dikin, bi taybetî piştgîriya tevahî li Rojavayê Kurdistanê dikin. Her wiha daxwaza diyaloga di navbera aliyên Kurdan li Rojava dikin, ew jî ji bo parastina mafên gelê me yê li rojavayê niştimane.

Guhertin

Konfederasyona Revenda Kurdistanî logoya xwe guherî û destûreke nû darişt û bi dengên giştî hate pejirandin. Di heman demê de guhertinên dinê Endamên Komîteya Birêvebiriye bi rêjeya perçeyên Kurdistanê kir. Her wiha yekemîn car e bi wekheviya

Kurdistanî, Şukrî Berwarî Cîgirê Serok û Berpîrsê Nivîsîngeha Darayî, Rehîm Reşîdî Berpîrsê Nivîsîngeha Peywendiyên, Şermîn Bozarslan Berpîrsa Nivîsîngeha Rêxistinê, Hermin Ehmed Berpîrsa Nivîsîngeha Medya û Ragihandinê, Leyla Dîwbend Berpîrsa Nivîsîngeha Jinan, Nûşîn Mîşo Berpîrsa Nivîsîngeha Xwendina Zimanê Kurdî, Wezîr Kinyazî Berpîrsê Nûnerayetiya

jinan li komîteya birêvebiriye de hatin hilbijartin ku hejmara wan deh kese. Wate pênc jin û pênc zilamin û du yedek in ewe jî ji heman wekheviyê li ber çav hatiye wergirtin, komîteya giştî jî ji Serokê Federasyonan pê ktê.

Dr. Îsmail Kamil Serokê Konfederasyona Revenda

Tixûbê Navçeyên Rûsya (Qefqas), Zaza Kelaşov Berpîrsê Nivîsîngeha Ciwanan, Kovan Amêdî Berpîrsê Nivîsîngeha Şewirmendiyê.

Her wiha li gor destûra nû, Komîteya Giştî ku ji Serokên Federasyonan pêk tê, di civînekê da Nadir Doxatî wekî Sekreterê Komîteya Giştî hate destnîşankirin. ■

ÇEKDANÎNA PKKÊ DI BERJEVENDIYA HEMÛ KURDAN DE YE!



Kovan Amedî

Rojnamevan Swêd

Bi xweşî û nexweşiyê ve, bi sedan sal in ku kurd, bi gelên ereb, tirk û faris û bi hûrgelên din re wek cîran bihevra dijîn, mixabin yek ji wan jî ne dilşa ne û heta nuha jî di têkiliyên wan de rewşeke baş çênebûye û sal bi sal xerabtir bûye.

Herema rojhilata navîn wek volkanekî dikele!

Li Kurdistanê êş, azar, mirin û wêrankerî bi hemû nexweşiyên xwe ve berdewam e. Bersîva hemû serhildanên kurdan, bi kuştin û qetlîaman ve hatiye dayîn. Bi sed hezaran kurd jiyanên xwe ji dest dane, bi milyonan kes ji cîh û warên xwe hatin ji dûr xistin, yan jî neçar bûne ku berên xwe bidin welatê xerîbîyê. Li gel van hemû şer û pevçûnan ve, heta niha jî ne dagîrkeran karîbûn kurdan xelas bike, ne jî kurdan karîbûn bigihîjin meramên xwe. (ji bilî ku li Başûrê Kurdistanê statuyeye federalî hatiye bidestxistin.)

Bi Şerê Îsraîl- Hamasê, Îsraîl Hizbullah li Lubnanê û şerê bi Îranê re, pişt û baskên rejîma Îranê gelek lawaz bû. Wek tê zanîn rejîma Beas ya Sûriyê, bi alîkarî û piştgiriya Rûsya û Îranê ve li ser pîya disekinî, bi vekişandina Rûsya û Îranê ve, Rejîma Sûriyê hilweşiya.

Tirkiye dixwaze vê guhartina ku li Sûriyê pêk hatiye, bo berjevendiya xwe wek firsendekê bi kar bîne

Xuya bû ku Tirkiye ji ber têkiliyên xwe yên bi HTŞê re ji guhartinên li Sûriyê çêbe pêşxwet haydar bûn. Ji ber wê yekê jî serokê partiya MHPê Devlet Bahçelî ji Abdullah Ocalan dixwaze ku ji PKKê daxwaza çekberdanê bike û PKK xwe fesih bike û rewşa Tirkiyê bê normalîzekirin. Serokomarê Tirkiyê Recep Tayyip Erdogan jî piştgiriya Devlet Bahçelî kir. Devlet Bahçelî ku di pîrsa kurd de siyasetmedarekî herî tundrev e û heta niha jî hebûna pîrsa kurd qebûl nekiriye û nake jî.

Daxwaza çekdanîna PKKê ne daxwazeke nû ye. Di sala 2013an jî daxwazeke wisa ji Ocalan hatibû kirin, Ocalan jî di Newroza 2013an de bi nameyekê ragîhandibû ku bê merc PKK dawî li şerê çakdarî bîne. Lê ew daxwaza Ocalan bi ser neket.

Eşkere ye ku daxwaza Devlet Bahçelî bi rewşa Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê ve girêdayî ye. Dixwazin ji gorankariyên ku li Sûriyê rûdide, kurd nebin xwediyê statuyeye netewî. Ji ber wê yekê Ocalan dixin dewrê ku li ser HSDê badorekê bike ku ti daxwazên statuyeye netewî nekin, bi hin mafên biçûk ve bê îknakirin. Her wisa tirseke din a Tirkiyê jî ew e ku piştî lawazbûna Îranê, PKK bi Îsraîl re tevbigere.

Em dibînin ku Tirkiye li Sûriyê gelek çalak e. peyvendiye di navbeyna Tirkiyê û Sûriyê de ji gelek alîyan ve dimeşe. Serokê îstixbaratê û wezîrê derve yê Tirkiyê bû çend car e ku serdana serokê HTŞê Ahmed Şare û wezîrê derve Esad Hasan Şeybanî dikin û dixwazin di avakirina bingeha dezgeha îstixbaratê, di avakirina hêza leşkerî û îdarî ya Sûriyê de, karê şewirmendî û perwerdeyê bigrê ser xwe. Tirkiye ti



tişekî venaşêre û bi êşkere dixwaze Sûriyê kontrol bike û pêşî bo bi destxistina statuyeye netewî bo Rojavayê Kurdistanê bigre.

Him serokomarê Tirkiyê û him jî hevkarê wî Bahçelî, bi awayekî zelal tînin ziman ku di rojeva wan de prosesa çareserkirina pîrsa kurd nîne.

Ez bi xwe şerê çakdarî ya PKKê ti carî di qezenca kurdan de nabînim. 40 sal e ji bilî kuştin, koçberî, wêrankerî ti tiştêk bi destê kurdan neketiye. Loma çekberdan PKKê di berjevendiya gelê Kurdistanê de dibînim. Bi çekdanîna PKKê ve hinceta "terorê" ji destê Tirkiyê tê girtin. Ev yeka wê di berjevendiya

hemû beşên Kurdistanê de be. Tirkiye wê nikaribe bi hinceta terorê wek berê erîş bibe ser Başûr û Rojhilatê Kurdistanê.

Çekdanîn, dikare zemîna xebata siyasî li Tirkiyê li Bakurê Kurdistanê jî baştir bibe. Xebatek bi metodên demokratîk û aştiyane, dikare rê li guhartinên erênî veke ku Tirkiye jî mecbûr be di siyaseta xwe de guhartinan pêk bîne.

Îro dilê rojhilata navîn li Sûriyê lê dide!

Wek tê zanîn, Sûriye ji gelek netewe û ji pir olan



pêk tê. Beşek ji Sûriyê li jêr kontrola Artêşa Azad ya Sûriyê ku ser bi Tirkîyê ve ye, Heyeta Tehrîr El Şam ku bi îdeolojîya xwe ve nêzî El Qayidê û cîhadî ne, nuha Şam û Helebê kontrol dike. Rojavayê Kurdistanê Ji aliyê HSDê ve ku bi giranî ji YPGê pêk hatiye, tê kontrokirin. Serokê Heyeta Tehrîr El Şamê Ahmed Şare, di peyamên xwe de nerm e, behsa maf û azadiya pêkhatayên din yê Sûriyê dike û dibêje: “Kurd parçeyekî bingehîn ê pêkhatayên Sûriyeyê ne” ev gotineke raste, lê tenê di gotin de ye.

Li gor ku ez dişopînim peywendiyên Şam û Rojavayê bi başî tîrî xandin. Guftugo li ser pirsê Rojava her berdewam e. Lê ne di warê destûreke nû de, ne jî li gor peyamên nerm, ti gav nehatiye avêtin.

Ahmed Şare, daxwaz dike ku hêzên çekdar nemînin û yê heyl beşdarî artêşa Sûriyê bin. Wezîrê karên derve yê Sûriyeyê Eshed Hesên Şeybanî jî têkezî bi wê yekê

dike ku HSD çekên xwe deyne, lê behsa bedêla danîna çekan nayên kirin. Ji bo xweşkirina dilê Tirkîyê be jî behsa alternatîfa duyem jî dike ku ew jî bikaranîna zorê ye. Ev jî gotina ”dijminê bav û kalan nabe dostê lawan” tîne bîra meriv.

Rola aktorên derve li Sûriyê

Sûriyê wê çawa bê ser lingê xwe, pirs û pirsgerînkên xwe bi pêkhatayên Sûriyê çawa çareser bike? Di vê pirsê de rola aktorên derve gelek girîng e. Eger em li dîrokê vegehin, peymanê Sewir, Lozanê, dabeşbûna Kurdistanê û avabûna Iraqê û Sûriyê de jî rola sereke ya aktorên derve yê weke Fransa, Brîtanîya, Amerîka û Ewropa yê bû. Ev dewletana îro jî li qadê ne.

Trump û kodên siyaseta wî ya ayende li ser heremê û bi taybetî jî li ser kurdan wê çawa be. Trump di mijara

kurd û Kurdistanê de, di navbera Îsraîl- Tirkîye, Iraq û Herema Kurdistanê de siyaseteke çawa birêve bibe?

Gelo wê Trump, wek tê gotin di Îlona 2025an de, hêza xwe ji Bexda û derdora wê û di dawiya sala 2026an de jî ji Başûrê Kurdistanê bi temamî vekîşîne! Ev ne diyar e, di wî warî de Trump, him li nalê him jî li bizmarî dixê. Li gor raya min, eger Amerîka bi temamî ji Başûrê Kurdistanê derkeve, ev tê wateya vekîşîna ji Rojavayê Kurdistanê jî. Ew jî vekîşîna Amerîkayê ji Rojhilata Navîn e! Ev ne ewqas hêsan e. Vekîşandina Amerîkayê ji herema Kurdistanê û ji Rojavayê Kurdistanê, ne di berjevendiya Amerîkayê da ye. Di warê jeopolîtîk de jî Kurdistan bo Amerîkayê ne weke Afganîstanê ye. Yekîtîya Ewropayê (YE) bi taybetî Fansa û Almanya jî naxwazin Amerîka hêzên xwe ji heremê vekîşîne û di Sûriyeyê nû de têkezî bi parastina mafên kurdan dikin.

Paşeroj wê çawa be, kabîneya Trump ya nû, Kongre,

Îsraîl û dostên kurdan bandora wan çiqas li ser Trump heye? Em ê bi he vre bişopînin...

Riya serketina kurdan di yekgirtinê de ye

Bi qasî aktorên derve, aktorên hundir ango rewşa heza kurdan jî girîng e! Îro Kurd bihêztirîn pêkhateya Sûriyê ye. Kurd ne li ser hev bin jî, bi rêxistinî ne, organîzekirî ne. Kurd, li Sûriyê neteweyeke esasî ye, divê daxwazên wan, mafên netewî bin. Pêwîstî tenê bi rastkirina mala kurd heye. Berê ku bi Şamê re rûnên, divê di nav xwe de lihevhatineke netewî saz bikin, bi taybetî jî HSD û ENKS. Divê kurd vê fersenda ku îro bi destê wan ketiye baş bi kar bînin û li Şamê yekdeng bin. Riya serketina kurdan di yekgirtinê de ye! Hevdîtina serokê HSDê Mezlûm Ebdî, bi serok Mesûd Barzanî re, hengaveke girîng bû. Hêvîdar im HSD guh li şîretên serok Mesûd Barzanî bike! ■

DU PÊLEWANÊN KURD LI ÛKRAYNAYÊ BÛN YEKEM Û DUYEM



REWEND

Palewanê kurd Daniel Rehîm ku wekî Mir Kurd tê naskirin, 22 salî ye û li Ûkraynayê werzîşkarekî profesyonel ê palewanîyê ye. Rehîm di di pêşbirka Brezilya Jiu Jitsu de (BJJ) bû şampiyon.

Palewanê kurd Daniel Rehîm li Kieva paytexta ûkraynayê di pêşbirka Brezilya Jiu Jitsu (BJJ) de, di beşa pêlewaniyê de, di sikleta 85,5an de Kurdistan temsil kir ango li ser navê Kurdistanê beşdarî pêşbirkê bû di encama wê pêşbirkê de serkeftineke mezin bi dest xist û bû yekem û madalyaya zêrîn qezenc kir.

Herwiha di heman pêşbirka pêlewaniyê de werzîşkarekî din ê kurd, Alan Mohammad Reza'yê 11 salî jî, di sikleta 50,5an de bû pileya duyemiyê wergirt û di pêşbirkê de bû xwediyê madalyaya zîvîn. ■



BÛBÊ ESER RÊBAZ XWE NASÎN E



REWEND

Nivîskar Bûbê Eser nivîskarekî ji bakurê Kurdistanê ye. Bi eslê xwe ji Dêrika Çiyayê Mazî ya ser bi Mêrdînê ve ye. Heta niha 13 pirtûkên wî hatine weşandin. Çar ji wan li ser Enfala Barzaniyan, tekoşîn û berxwedanên wan e. Pirtûka wî ya dawî bi navê 'Rêbaz' ji Weşanxaneyê Akademiya Zilanê ve li bakurê çap û belav bû. Bûbê Eser, di berhema xwe ya bi navê Rêbazê de behsa rêbaza pîroz a Barzaniyan dike.

Nivîskar Eser li ser pirtûka xwe ya dawî ji Kovara Rewendê re axivî û got, wî girîng dîtiye û xwestiye serhildan û berxwedana Barzaniyan li ser esasê راستiyê bi ciwanan bide zanîn, lewma jî ev babet kiriye mijar ji xwe re.

Bûbê Eser di sala 1955an li bakurê Kurdistanê li gundê Xozberiya bajarê Dêrika Çiyayê Mazî hatiye dinyê. Wî dibistana serata li gundê Qesra Qenco, dibistana navîn û lîse jî li Mêrdînê qedandiye. Bi gotina wî, di sala 1975an de bûye endamê PDKT (Partiya Demokrat a Kurdistanê Tirkîyê) jî wê salê de rêbaz naskiriyê û li gor wê heta ku jê hatiye karên xwe yê siyasî û kulturî li gorî wê meşandine.

”Piştî nasîna rêbazê û endametiya min ya partiye min bi awayekî çalak dest avêt karê siyasî ya ji bo azadiya Kurdistanê. Her weha min di sala 1975an de zankoya aborî li paytexta Tirkîyê qezenc kir. Piştî xwendina sê salan ku salek mabû min ê zanîngeh biqedenda, ez jî aliyê polisên tirk ve, li bajarê Diyarbekirê hatim girtin.”


Ji ber xebatên xwe di Zindana Amedê de dimîne

Eserê ku wê demê serokê komîteya partiye ya Diyarbekirê bûye gelek tiştên partiye yê nehênî li serê hatin girtin. Ew bûne sedem ku êşkenceyên mezin lê bên kirin. Eser, wiha behsa wan rojan û xweragiriya xwe dike:

”Hemî metodên xerab anîn serê min ku ez qise bikim. Navê heval û çalakiyên partiye bidim wan. Ji ber vê ez 72 rojan di bin êşkenceyên wan de mam. Lê min yek gotin jî negot. Ew ango polisên êşkence li min dikirin qeherîn (gelekî acizbûn). Zêde ceriyan dane min û dilê min disekine. Ji bo mirina min nekeve hustiyên wan. Kincên min li min dikin û min di qatê çaran de diavêjin jêr. Ez li ser siyara wan ya li jêr sekinî bû, dikevîmin û dilê min ji nû de dixebite. Wan him ez kuştim him jî bi wê avêtinê sax bûm.

Min hefteyekê di wî halê xerab de li nexweşxanê dihêlin û dûre dîsa min dibin cihê êşkencê. Li vir jî min tiştên xwestin neda wan. Loma vê carê jî agir berra nigê min ê çepê dan û boksek bi şidet li min dan û çûn. Piştî çûyina wan min agir vemirand û nemirim.

Dûre ez birim zîndana Diyarbekirê ku wir jî cihê êşkencê û ji dojeha tê behskirin xerabtir bû. Li vir piştî du sal û şeş mehan hatim tahliyekirin. Ji zîndanê derketim lê doza min her berdewam bû. Piştî zîndanê





ji polîsan tim li min dipirsîn. Loma mecbûr bûm ku welatê xwe biterkînim. Bi halekî nexweş dawîya sala 1983an hatim Swedê li vir jî du salan tedawiyên min li nexweşxaneyan domand. Piştî du emeliyetan ku hinekî baş bûm, min dîsa dest avêt siyasetê û karê nivîskariyê. Her weha min di sala 1986an de sond xwar ango ahd kir ku ez ê qet bi tirkî nenivîsîm û bi kurdan re tirkî qise nekim. Ji ber ku di wê zîndanê de kurdî axaftin li me qedexa kiribûn.”

Berhema Bûbê Eser ya ewil li ser zîdana Amedê bi navê Gardiyan di sala 1994an li Swedê bi kurmançî hatiye weşandin. Gardiyan, gelek caran bi Kurmançî û dîre bo yunanî, tirkî, soranî, swedî û erebî hatiye wergerandin û weşandin. Wergera wê ya Îngilîzî jî li ber çapê ye. Heta niha 13 pirtûkên wî hatine weşandin. Çar ji wan li ser Enfala Barzaniyan e, tekoşîn û berxwedanên wan e.

Min xwest berxwedan û tekoşîna Barzaniyan li bakurê Kurdistanê bi nîfşê nû bidim zanîn

”Ez weke nivîskarekî Kurd ji bakurê Kurdistanê armanca min ew e ku bikaribin berxwedan û tekoşîna Barzaniyan li bakurê Kurdistanê bi nîfşê nû bidim zanîn û nasîn. Ji ber ku li ser destê PKKê piraniya ciwanên bakurê Kurdistanê Barzaniyan weke xayîn ango dijminê kurdan nas dikin. Ji ber ku PKK bi salan di hemî medyayên xwe de ji bo kurdên bakurê Kurdistanê û hemî kurdan bikin dijminê Barzaniyan ev kar kirine û dikin. Ez jî hewl didim ku bi van berhemên xwe derew û boxtanên PKK ji bona ciwanên kurd îspat bikin, dinivîsînim. Dixwazim bidim îspatkirin ku PKK li gel medyayên xwe derewan li gelê kurd û Barzaniyan dike. Ji ber vê girîngiyê ye ku min dest avêt mijara Barzaniyan serhildan û berxwedanên wan li ser asasê rastiyê li bakurê Kurdistanê, bi ciwanan bidim zanîn. Ez bi vê xebatê xweşbîn im ku di hin waran de bi ser jî ketime. Van berhemên min yê bi kurmançî ku li ser tevger û şoreşên Barzaniyan îro di malên gelek ciwanên Kurd yê bakurê Kurdistanê de hene.”

Em bi rêbaza Barzaniyan bûn xwediyê başûrê Kurdistanê

Bûbê Eser li ser berhema xwe ya dawî bi navê wê Rêbaz ango rêbaza pîroz ya Barzaniyan dibêje, her miletek xwedî rêbazekê ye û Kurd jî xwediyê vê rêbaza pîroz in. Her miletek bi saya rêbaza xwe,

têdikoşe û miletê xwe dighînin azadiyê.

”Em Kurd jî bi saya vê rêbaza pîroz, berxwedan û serhildanên Barzaniyan bûna xwedî perçekî Kurdistanê azad ango başûrê Kurdistanê. Loma min jî bi vê berhemê xwest ku rêbaza pîroz li bakurê Kurdistanê bi ciwanên ku PKK serê wan tevlihev kirine, bidim xwendin da ku ew xwe ji wê tevliheviyê azad bikin. Rêbaza xwe baş nas bikin û fêr bibin. Kurdên ku vê rêbazê fêr bibin, wê miheqeq welatê xwe jî bighînin azadiya wî. Rêbaz, felsefe ye, loma miletê bê rêbaz weke cêşeke bê çek û seriyeke bê mejî be. Barzaniyan bi tekoşîna xwe ya sed salan, di jiyana de ji bo me kurdan rêbazek afirandine. Divê em jî weke rewşenbîr û nivîskarên vî miletî wê rêbazê binivîsînin û bidin xwendin da ku ciwan bi rêbaza xwe mezin bibin. Ciwanên rêbaza xwe nas bikin, wê tim berjewendîya gelê xwe bidin pêş.”

Rêbaz xwe nasîn e

Rêbaz xwe nasîn e. Heta ku tu xwe nas neke tê nikaribe xwe bide naskirin. Rêbaz şoreş e, heta tu wê fêr nebe, tê nikaribe li ser hizra neteweyî tekoşîna gelê xwe bide. Rêbaz wekhevî ye, xweşbînî û xweragirî û gelek tiştên din e. Heta ku tu vana fêr nebe tê nikaribe yekîtiya gelê xwe pêk bîne. Qîmet û rûmeta mezinên xwe bizanibe. Rêbaz al e, heta ku tu ala xwe nas neke tê nikaribe tekoşîna miletê xwe jî nas bike. Bi kurtesî rêbaz ji bo kurdan jiyana û xwe azadkirin e.

Heger heta niha kurd li perçeyên din ê Kurdistanê bi ser neketibin, ji ber ku ne xwedî rêbazekê bûn. Azadiya başûrê Kurdistanê li gor xal û rênîşandina vê rêbazê hatiye kirin. Ji bo ev bê fêmkirin divê ev berhem bê xwendin. Bi nivîsekê mirov nikare rêbazê şîrove bike. Xweşbîn im ku min bi van berhemên xwe erka xwe anîbe cih û karê min ê nivîsandinê de her berewam be.

Bi vê munasebetê ez spasîya Kovara Rewendê dikim ku ev derfet dane min da ku bi kurtî jî be behsa xwe û berhemên xwe bikim. Erkê nivîskaran yek jê ew e ku serhildan, berxwedan û tekoşîna gelê xwe binivîsînin da ku nivîşên nû dîroka xwe baş nas bikin. Şanogerên me li ser dike bilîzin û filmçêkerin me ji divê vana bikin filmê sînemayê da ku nîfşê nû û cihan jî dîrok û tekoşîna Barzaniyan ya rast nas bikin. ■

ZUBÊR SALIH SEBAH EL-XEYR BÛYE NASNAME JI MIN RE



Mewlûd Oguz

Rojnamevan,
Stenbol

Gelo pêkan e ku stranek ji hunermedekî re bibe nasname ango dema tu navê hunermedekî bibêjî yekser stranek bê bîra her mirovî. Tu navê stranê bibêjî yan beşek ji stranekê binehwirînî yekser navê hunermendî bê bîra her kesekî? Hunermendê ji Rojavayê Kurdistanê Zubêr Salih diyar dike ku strana Sebah el-xeyr jê re bûye nasname. Zubêr Salih, “Tu li kê derê bêjî Sebah el-xeyrî xana min, wê ji te re bêjî Zubêr Salih. Yan jî tu bêjî Zubêr Salih, wê ji te re bêjî Sebah el-xeyrî xana min. Bi rastî, ji min re bûye nasname.”

Hunermendê hezkirî Zubêr Salih, bi eslê xwe hunermedekî ji Rojavaya Kurdistanê ye. Ew li gundekî girêdayî Dirbêsiyê, li gundê Delîk ji dayik bûye û zaroktiya xwe li wî gundî derbas kiriye û heta 9-10 salî li wî gundî maye. Paşê ew malbatî çûne Dirbêsiyê û demekê li wir mane. Piştê mala xwe ji Dirbêsiyê bar kirine Hesekê û ew nêzî 15-20 salan jî li wir mane. Piştî wê di salên 2000î de bi malbatî derketiye Ewropa û li Almanyayê bicî bûye û hêj li wir dijî û diafirîne.

Zubêr Salih, diyar dike ku wî di temenekî biçûk de dest bi hunerê kiriye. Ji ber malbata wî malbateke

muzîkhez bûye, ji muzîkê û hunerê hez kiriye. Bavê wî bi xwe dengbêjê koşk û civatan bûye. Ew û birayê xwe li ber destê wî fêrî amûra biskê û stranê bûne. Ew, di destpêka salên 2000î de ji ber rejîma Esed û partiya Beis neçar dimîne welêt biterikîne û bi malbatî li Almaniya bicih dibe û hê jî li wir dijî. Salih ji Kovara Rewendê re behsa serpêhatiya xwe ya muzîkê kir:

Xerîbî nikare bandoreke mezin li ser hunerê bike

“Dema ku hunermend li Ewropa bijî yan li welat bijî, bandora Ewropa yan jî bandora xerîbiyê li ser hunera wî dibe. Tu bêjî nebêjî tu li derveyî welat û xaka xwe yî, ew hestên te yî ku tu li ser xaka xwe bî, tiştêk e û hestên ku tu li derveyî welatê xwe bî tiştêkî din e. Mesele, piraniya stranên me yên li derveyî welat li ser xerîbî û xurbetê, li ser penaberî û bêrikirina welat in lê dema ku tu li welat bî stranên hezkirinê, netewî û welatparêziyê ne; stranên li ser civatê ne, ferqek tê de heye. Ê min, dema ez di salên 2000î de hatim Ewropayê, ji bo min belkî ji hêlekê de baştir bû, ji ber ku li vir bêhtir serbet û azad bûm min bêhtir karîbû hunera xwe bi pêş bixim. Welat di bin rejîma partiya Beis de û Esed de bû. Di bin zilm û zordariya wê rejîmê û partiyê de me nikaribû bi hêsanî stran û tiştên di dilê xwe de bêjim lê dema ez hatim Ewropayê, bêhtir azad bûm û min karîbû bi hêsanî û azadî stranên xwe bibêkim; derfeta min a tomarkirinê çêbû û min karîbû bêhtir ya dilê xwe bibêjim.”

Zubêr Salihê ku ev ev zêdetirî 25 sal in ku li Ewropa dijî û bi berdewamî stranên li ser welat û şehîdan, li ser pêşmerge û şervanan û li ser hezkirina welêt çêdike û wî arşiveke berfireh afirandiye û diyarî gel kiriye. Li ser jiyana li Ewropayê û bandorê xerîbiyê li ser hunerê

destnîşan dike ku Ewropa ji bo wî bûye sedemek ku bêhtir bi welatê xwe ve bê girêdan.

Sebah el-xeyr bû wek nasnameyêkê ji min re

“Li Ewropayê, min bêhtir bêriya welatê xwe kir, min bêhtir êşa miletê xwe got, min karî bi serbestî û azadî ya dilê xwe bibêjim. Çi kaset û çî CD û çî jî vîdeo klîb bin ez bê rawestan karê xwe berdewam dikim. Kesê ku hunermendê esîl û xwedî netew be û ji çand û hunera xwe hez bike, eger li Afrîka jî bijî û li dawiya dinyayê be jî ew ê her bi hestên xwe berdewam be û hunera xwe bi pêş bixe. Yanî xerîbî nikare bandoreke mezin li ser hunerê bike, bi pêş de bibe yan bi şûn de bide. Berovajî wê li Ewropa mirov dikare bêhtir hunerê bi pêş ve bibe, ji ber ku derfetên te hene û valahiyek li cem te heye, tu dûrî welatê xwe yî, lewma jî bêhtir hestên mirov bilind dibin. Tu dikarî hunera xwe zêdetir bi pêş bixe, Ewropa ji bo min ev bû.”

Salih, dibêje wî strana Sebah el-xeyrî xana min ku gotinên wê ayîdî Melayê Cizîrî ne, di salên 86-87an de afirandiye lê di sala 88an de li ser kasetê hatiye tomar kiriye û belav kiriye:

“Di salên 2000an de dema ez hatim Ewropayê me ew stran kir vîdeo klîb û êdî li her çar perçeyên Kurdistanê belav bû. Bêguman helbest, xwedê jê razî be, ya Mela Ehmedê Cizîrî ye. Dibistana wî Medresa Mor li Cizîra Bota ye, ew çiyê wî ye, li wir jiyaye. Ez texmîn dikim berî 450 sal bêhtir ev helbest hatiye nivîsîn û di dîwana wî de cî digire. 86-87an, biraderek hat ba min, ew jî muzîsyen e, navê wî Abdo Ebdurrehman Dêrikî, ew jî ji bajarê min, ji Dirbêsiyê ye. Hat cem min, got min dîwanek Melayê Cizîrî bi dest xistiye, navê dîwanê jî El



Akd Cewherî. Du beşên dîwanê hebûn. Wî got min ev dîwan bi dest xistiye û berî 450 salî helbestvanek heye û bi vî şeweyî dinivise, got ka bixwîne. Min bi xwe awazek ji bo Sebah el-xeyrî xana min çêkir, ka lê binerê, çi dikeve serê te. Eger tu hez bikî vê stranê wek xwe bibêje û eger tu karibî tiştekî din ê Melayê Cizîrî jî bibêjt baş e, ji ber ku Melayê Cizîrî qamek bilind e di nav çand û hunera me de. Dema min helbest xwend, ez hinekî şaş mam, bêguman ji ber ku bi çar zimana ye, zimanê erebî, kurdî, tirkî û farisî jî de heye, ji min re xerîb hat. Min got keko ev çar ziman wê ji min re hinekî zehmet bê, Got tu jî hewil bide. Axir min go tamam. Wî helbestek bi awazê xwe ji min re got û min got sihetxweş, malî ava. Min jî got ka çi bi min re derdikeve. Piştî ku ew ji cem min çû, piştî çend rojan ez li ser helbestê sekinîm ez rabûm min li gorî xwe awazek jê re danî. Ev helbesta ku aniha hunerê lûgê dîkin, Sebah el-xeyrî xana min, awazê wê ye min e. Awaza hevalê ku dîwan ji min re anî, ya Ebdurrehan Dêrikî hinekî ji ya min cuda ye. Bi awaza min helbest belav bû. 86-87 min li şahî û dawetan min digot û di 88an de êdî min tomar kir. Wê çaxê min 12 perçeyên stranê digot, aniha beşên ku bûye klîb 3-4 perçe ne. Di kasetê de 12 perçe ne lê di klîbê de 3-4 perçe ne. Ev helbest bêguman bû wek nasname Zubêr Salih. Aniha tu li kî derê bêjt Sebah el-xeyrî xana min, wê ji te re bêjin Zubêr Salih, yan jî tu bêjt Zubêr Salih, wê ji te re bêjin Sebah el-xeyrî xana min. Bi rastî, ji min re bûye nasname ji min re, şanaz im bi vî yekê.”

Ji helbestên Melayê Cizîrî 2 CD amade kirine

“Peyre di salên 96an de min ji bo 8 helbestên din ên Melayê Cizîrî jî awaz danîn. Şox û şengê, Saqî werîn xama zucac, Xelkino li min kin şîretê, Îd e û her kes jî dîdara te beîd, Me ji husn û cemelê çi xered û hwd. Min ji van 8 helbestan re jî awaz çêkirin. 5-6 sal berê dîsa li Ewropa 8 helbestên din ên Melayê Cizîrî, min ew jî afirandin, çêkirin û awaz dane wan. Kanatê Rûdaw, mala wan ava be, Berpirsiyarê Rûdawê, seydayê Ako Mihemed peywendî ligel min kir û got ku em dixwazin ji bo berhemên Melayê Cizîrî piştgiriya te bikin û tu wan bi awayekî profesînel tomar bikî. Min du berhem çêkirin yek ji wan ya 96an me car din tomar kir. Berhema vê taliyê me ew jî ji nû ve bi rêk û pêk tomar kirin. Wekî du CD hatin amadekirin, di her CDyekê de 8 stran hene ku ji helbestên Melayê Cizîrî ne, min ji wan re awaz çêkirine.

Wê çaxê min ji Seydayê Ako [Mihemed] pirsî, hûn ji bo çi dixwazin alîkariya min bikin ku ez helbestên Melayê Cizîrî tomar bikim. Got yaw strana Sebahul

xeyrî gelekî deng da û got bavê mezin, xwedê jê razî be, nemir Mele Mistefa Barzanî dema çû ser dilovaniya xwedê, di tûrikê wî de, di çenteyê wî de du pirtûk dîtine. Yek jê Quran bû û yek jî dîwana Melayê Cizîrî bû. Ji bona wê yekê em jî Melayê Cizîrî jî hez dikin. Ev jî sedema tomarkirina wê û alîkariya Rûdawê ji bo min bû.

Salih, diyar dike ku ew ne siyasetmedar e lê ji ber ku ji Rojava ye rewşê ji nêzik ve dişopîne. Ji ber ku gelek gelek ziyar ji destê vî rejîmê dîtine, destnîşan dike ku rejîma Esed û ya Sedam eynî rejîm bûn, yek bûn. We jî ew êş ditiye û me jî ew êş kişandiye:

“Derketina min î ji welat û penaberîya min ji ber rejîma Beis bû, gelekî astengî ji min û ji hunera min re çêdikirin. Nedihiştin ku em bi serbestî azadî li ser êş û derd û xemên xwe stranên xwe bibêjin. Di salên dawî de, di 2000an de dema ez derketim zehmetiyeke zêde ji min re çêdikirin ji bo ku ez dev ji hunerê berdim û êşa milletê xwe nebêjim. eger ez ji welat derneketama niha li welat tunebama ango di hepsa Sednaya de bama. Ji ber ku gelekî tahde li min kirin. Ji 80yî û heta 2000î, di wan salan de min stran digotin û stranên min jî dihatin hezkirin û cemawerekî min î mezin hebû. Wan dît ku ez di warê hunerê de bi pêş de diçim û gelek gavan diavêjim û gelekên girêdayî min hene, cemawerê min mezin dibû û bandora stranên min li ser millet dibû. Ji 93yan û vir ve me êdî li derve newroz pîroz dikir û ez beşdarî ahengên newrozê dibûm, millet gelekî bi min ve girêdayî bûn. Bandora gotina min li ser civakê dibû. Ji ber wê yekê jî rejîma Esed xwest min bêdeng bike û xwestin ez dest ji hunerê bikişînim û nêzikî stranên siyasî nebim. Gelek tahde li min kirin û ez mecbûr mam ez û malbata xwe mee berê xwe da weletekî ku me nedizanî berê me li kî derê ye. Me got kîjan welatê dinyayê be em bicî bibin da ku em ji rejîma Esed xelas bibin û ez karibim bi serbestî û azadî stranên xwe bibêjim.”

Bi raya Salih ji bo kurd li Rojava destkeftiyar û statuyekê bi dest bixin derfet heye. Bi sedê salan jî dîsa ew ê derfeteke wisa neyê. Ya herî girîng ew e ku kurd ji vî yekê bêpar nemînin û wekî başurê Kurdistanê mafên xwe û hukmekî federalî bi dest bixin:

Hêvîdar im Rojava jî bibe perçeyekî xweser û azad

“Ji bo ruxandina rejîma Esed xwîna gelek ciwanên me hat rijandin, ji dema ev serhildana ku li Rojava çêbû, di salê 2011an de serhildanên kurdan jî dest pê kirin

û herêma Kurdistanê Rojava jî rabûn ser piyan. Wan jî hewildanên xwe kirin û bi xwîneke germ xwestin ku herêma Rojava ji destê rejîma Esed û misilmanên tundrew (wek ku tê naskirin DAIŞ) biparêzin. Bi rastî jî kêma zêde herêm parastin. Herêma me, Rojavayê Kurdistanê helbet bi xwîna ciwan û keç û xortên me, milletê me li ber xwe dan û Rojava heta konaxa îro parastin. Jimarê ez tam nizanim lê ez texmîn dikim di vî şerî de nêzikî 15 hezar kesan jiyana axwe ji dest dan. Weke hunermendekî hêviya me ew e ku xwîna van ciwanên me bê encam nere, em jî bêpar dernekevin ji vî şerî û ji perçekirina Sûriyê, hêviya me ew e ku ew jî



bibe perçeyekî xweser û azad û li kêleka perçeyê me yê pîroz Başurê Kurdistanê ku herdu hêl destê xwe bidin hev û em sînore hevdu biparêzin û bi hev re alîkar bi. Ev jî hêvî û daxwaza me ye. Em di konaxê gelekî hesas re derbas dibin. Ya herî girîng ew e ku em ji vî yekê bêpar nemînin, mafekî zatî û hikmekî federalî bi dest bixin wekî ku li başurê Kurdistanê çêbû. Em dibînin xelkê me li wir bi serkêşîya kek Mesûd û kek Nêçîrvan [Barzanî] bi azadî dijîn, li wir Kurdistanê xweşik û delal hatiye avakirin û em pê serbilind in. Di nav dinyayê de em pê serê xwe bilind dikin û dibêjin me jî Kurdistanê heye.

Ger îro Rojavaya Kurdistanê jî ji wê tecrubeyê fêde bike, ew jî çek û silehên xwe daneynin û doza mafê xwe bikin. Li gorî zanyariyên min îro li Rojava îro

bêhtirî 150 hezar çekdar hene li Rojavayê Kurdistanê, karin li ber xwe bidin, hêzeke ne hindik e. Hêviya me ew e ku kurd bêpar nemînin. Wekî me gotî ji hikmekî zatî yan jî federalî ku em bi dest bixin û karibin weke kurdên Rojava xwe bi xwe, xwe bi rê ve bibin û em ji bin rejîmê ereban û bin destiya wan derkevin, ev hêvî û daxwaziya me ye, û dem jî îro gelekî guncaw e ji bo me. Piştî 15 hezar şehîd û ewqas berxwedanî û 15 sal şer û kar û xebat divê em tiştekî bi dest bixin. Eger me bi dest nexist ji xwe em ê winda dikin. Bi sedê salan jî dîsa ew ê derfeteke wisa ji me re neyê.”

Li ser pêşmergeyên qehreman du stranên nû

Hunermend Salih, wek her demê di kar û barên xwe de berdewam dike û dibêje çend berhemên nû li ber destê wî hene. Ew kaniyekê her tim dide, sekin û rawestan û aramî jê re tune ye. Niha ji gotinên Seydayê Tirêj straneke din jî amade dike. Ew jî strana Gozelê ye. Klîba wê di montajê de ye Herwiha ew dide zanîn ku li ser du stranên nû kar dike, herdu stran jî li ser pêşmergeyên qehreman in. Ji ber ku ew vî yekê weke erkeke niştîmanî li ser milê xwe dibîne û teqez dike ku, çek û sileha hunermendan saz û tembûra wan e: “Em jî bi sazê xebatê dikin ji bo milletê xwe da ku em karibin çand û hunera xwe hem biparêzin û hem jî bi pêş bixin.” ■

YEK JI JINÊN KURD ÊN SERKEFTÎ LI BRÎTANYAYÊ: SUNA ALAN



REWEND

Suna Alan, hunermend û rojnamevaneke kurd a bakurê Kurdistanê ye. Ew bi eslê xwe ji bajarê Çewlikê ye û niha li Londonê dijî. Ew bi dengê xwe yê xweş û konsertên cuda derdikeve pêş.

Malbata Suna Alan wekî gelek malbatên kurd hê di dema zarokatiyê de ji Kurdistanê, ji Çewlikê koçî bajarê rojavayê Tirkîyê ango Îzmîrê dike. Ew bi çanda kurd-ewlî û stranên dengbêjiyê mezin bûye û muzîka Îzmîrê jî bandor lê kiriye. Digel stranên gelêrî yên kurdî xwediyê repertuareke gelek berfireh û pir rengî ye û bi ermenkî, rûmî, erebî û tirkî jî distire.

Suna Alan ligel karê hunerê û stranbêjiyê bi kar û barê rojnamevaniyê jî dadikeve. Rojnamevan Suna, di sala 2018an de li platforma rojnamevanên afirîner a bi navê Brush & Bowê projeyeke bi navê “Projeya Rol Modelên Jin” cih girtiye.

Hunermend Suna, bi mebesta ku alîkariya erdhejzedeyên Tirkîyê û Sûriyê bike, di çarçoveya rêzekonsertên “Women in Music” (jin di muzîkê de) li Royal Albert Hall a li Southbankê konser da.

Suna, li Zanîngeha SOASê ku yek ji dibistanên girîng ên Brîtanyayê ye, di koma Kurdî ya SOASê de û di projeya SOAS Rebetiko Band de cih girtiye.



Herwiha ew li Londona Brîtanyayê û li derveyê welat beşdarî gelek aheng, festival û konsertên cihêreng bûye. „Di dinê de sê tişt hene“, „Dargerînok“ û „Heyder Heyder“ hin stranên wê yên bi nav û deng in.

Suna Alan, halê hazir li Londonê dijî û ji bilî karê stranbêjiyê, bi rojnamevaniyê ve jî mijûl e û mijarên li ser jinan, mafê mirovan û hawirparêzî bala wê dikişînin, dem bi dem ew li ser van mijaran gotar û hevpeyvînan belav dike. ■



PÊRAXISTINEKÊ JI PIRTÛKA EVÎN HEBÛN E Û HEBÛN ZANÎN E



Rêber Hebûn

Nivîskar, Almanyay

Yekem tiştê ku jîndar pêşî hizr dike têgihîştina wî ji heyînê re, mirov xwe nas dike bi rêya hebûnê , ji ber ew zemîn e yê li ser civak çêdibe, û jê nirx û pîvanên xwe werdigre, ji tek girêdanê ye yê mirov bi heyînê re girêdide, berî ku tiştan bi dest xwexîne, û ew têgihîştina evînê bi rêya çêbûna hest , ji ber ku hestkirina mirov bi derdorê ve bi têgihîştina xwe ji gewdeyê re pêşî destpê dike, û têgihîştina wî ji henas re û baweriya wî bi jiyane ve, û bawerî encamek e xwezayî ye çêdibe bi rêya qûnaxên yê kesê jîndar lê derbas dibe, taku ji rastiya nirxên ji evînê peydabûye piştrast be, a nûnertiya heyîna lihevhatî û bedew dike, û bi dûmahîka xurandinê bi wê ve zanîn encam da, zikmakîya evînê bi rêya zorengê binyad bû, ji bona serkeftina nirxên sirûştî,sîstem, û yasayên misoger ji heyîna komên mirovî re, û kedîkirina kiryarên wan, ji bo bidestxistina zanînê, û çawaniya bikaranîna alavên heyî, yê hatin e afirandin bi saya zanyar bi diyarbûna êgir û bikaranîna kevîr, û avakirina mal û çandiniyê, bi afirandina elketrîk û telefonê derbas dibe, ta şoreşa Kompioter û internête, wisa têkiliya mirov bi xwesera xwe ve diyar bû, bi rêya a din û cîhanê bi giştî çêtirtir bû.

Mirov çî girêdan di navbera xwe û heyîn û zanînê de winda kiribû bi encama serwerîkirina surîştîya

desthilatdariyê, wisa ji sabara zanînê dûrketibû, yê ewa nameya saxlem û diyar e ji evîn û jiyankirina wê, û pir caran bi têgehên afirandî pêguhertibû, ew têgeha diji zikmaka pak bû yê mirov lê vedigere bi sernavê evîn, ev girêdan ji dest xwe berdabû, pişt re têgehên zorengê ji bona şer destpê bûn, şûna weşandina nirxên evînê bi rêya şaristaniyê ve, yê cîhanê ji hatinên serdemên dirindetî û hovîtiyê rizgar kiribû.

Serdemên terorê destpê bûn, û li ser wê navê pîrozbûnê hat e danîn, û ew nixumek e paş wê ve naveroka şer a bingehîn tê weşartin, û ewa bidestxistin , bindestkirina aborî û gera li erdên nû û komkirina samanê .

Du şer mirovahî berhem dan, bi rêya xurandina bi heyînê re, zorenga zanînê yê tê nasîn bi zanist û sinc ve diji nezaniyê yê tê nasîn bi girêdana zanist bi hilweşînê ve, ji ber ku desthilat nirx, ol û netew pikaranî, pê pergala û nerînên teng belav kiribû ta têgeha cigirbûyî berhem bike, lê zanyar di sinc, vekolîna zanistî de guherînek e ji pêvajoka mirov berve başiyê ve ditîbûn, wisa zoreng di navbera cigirbûn û guherînê, parastin û guherînê, resenî û pêşveçûnê de çêbibû, û hemî bi zorenga herî mezin û rastqîn e ve girêdayî ne û ew : zorenga zanîn û nezaniyê.

Û heyîn ji van şerên xwînî talan bû, û êdî zêde berve parçebûn û gemarbûnê ve diçû û kambaxûna a ku ezeziya mirov berhem dabû, ji şer û qirkirin û bikaranîna çekên qedexebûyî (Holokust.1, Hîroşîma.2, Helebçe.3).

Beranberî wê heyîn berve sivîlbûn, avakirin, bedewbûn, huner û bêr ve diçe bi pêgirtina nirxa giştî ji mirovahiyê re li ser pîraliyên zimên û qam, û reftarên



wê di evînê de û ew rehjena zanîna nemir e, ji ber ku evîn û zanîn cewiyê hebûnê ne.

Hest, ageh, têgihîştin, hizr, ponijîn, ramanbûn û pirsîn ewan kiltên nasîna hebûnê ne, û van kiltan ji berhemê girêdana jîndara mirovî bi hebûnê ve ne, bi rêya evînê, û bi wan mirov heyînê ji bo zanînê vekolîn dike.

Û pevxurîna şaristanî a ku mirovê zanyar afirandibû,gerentiyê dida berdewabûna jiyana rast, ji zanîna wî bi alavan piştî zehmetiyekê, û bi encamê meraq û xwestina wî, li kelem û astengiyan de derbas dibû bi rêya pevxurîna wî ya berdewam bi hebûnê , û heta ku gîhabû nirxên rehniyê rastî gelek hewildanan hatibû, û berdewam hember rewrewka binkeftinê ,û mîkroba nezani, xwebînî û ezeziyê rikberî dikir.

Û bi xwezaya xwe ya mirovî de têgihîştibû meyldariya xwe ji têrbûna tam ta ku ji birçbûna gewdeyî û zayendî azad bibe, û dest bi gerînê li başiyên bike, ji vir em dikarin binav bikin ku têgehên devgemkirin û celewkirinê bûn sedemê mezinbûna girêkên hundirî li cem xelkê, û pêkanîna nameya evînê û vekolîna zanînê di heyînê de asteng kirin.

Zanîn ew zangoya ku bin de hemî mirov tevî dibin, bi rêya wê nakokiyên wanî nijadî, cîgehî, zayendî û bîrdozî kêmtir dibin , dikeve di berjewendiya çekirina sazî û yekîtiyên yê ji hemî netewan re derfetekê ji xweşî û cihbûnê peyda dikir, û bidestxistina pêdiviyên bi jinavbirina birçibûn, teror, nexwendeyî,û çekên qedexebûyî, û qedexekirina kedxwariyê û bazirganiya bi mirov û pêkanîna xwestekên malbatê şad yê cihbûna deronî diyar dike û nûnertiya astên herî bilind ji rehetiya mirovahiyê dike.

Nameya evînê yê mirovê hişmend mizgîniyê pê dabû bi şaristaniya ramanî, avahî û hunerî ve hatibû diyar kirin, wek rastiya bêsînor û bîner e li ser keda zanyar, rastiya bêsînor ewa hebûn e di yekbûna xwe de.

Ji ber ku tewriyên derbiderkirinê rolek e neyînî û bive listibûn û bi hevdû re li hember mirovahiyê hevkarbûn û wê berve qeyranên ceng û birçibûnê bi hatinên serdemên nezani û têkçûnê biribûn.

Û cengên mirovê ezez kaniyên evîn û zanînê bi hevdû re zuha kiribûn, û têgehên tundirewiyê di ol, rêgeh,com ,derdên nijadperestî û liyangirtinê û mîna wan de belavbûn, û bûn e destikek çewisandin ji



hatinrêzên rewanî û ramanî re li cem zanyar li hebûnê, û li ser mirovahiyê nezaniya giyanî û ramanî sepa kiribûn, û windabûn, tevlihevûn û goşegirtinê di tewriyên erdnîgarî û herêmîbûna teng de zêdebû.

Nasnama mirovê zanyar a nû zanîn e, nûnera jiyana nû dike, û destpêka radeya dawiya derdkişandinê ye û pêbirina azadiyan e, ta bibe zanîn civîndara giştî, taku bin de taybetmendiyên gelan li ser zemîna heyînê de tevli bibin, di nav de zanyar bi erk û mafê xwe ve wekhev dibin, bi rêya danîna nimûneya Konfidresiyonê, ji bo pêkanîna bazara aborî a mezintirîn, a bi rêya wê pêkanînen zanyarên berhemdar yekgirtî dibin, ji bo pêkanîna hêz û xweşiyê û xwestekên mirovê bala û afrêner, û vejînkirina bedewbûn, zanist û wêjeyê, ji bo xizmetkirina hebûn û mayîna wê.

Evîn nûnertiya hêza veşartî, afrêner û ne asayî dike, û kanînen xwe ji wê rêzkirina lihevhatî di hebûnê de bi xwe werdigre, û herwisa xweda diyar dibe, xwedawendê bedew û sermedî, gorî navê wî yê kevin û naskirî, di dîmenên hebûn û xweşîkbûnê wê de û di dabeşên sirûştta dilkêş de diyar dibe.

Ji ber vê yekê mirov eger bi çi xweşî û rindiyê hest bike, bi balabûn lê dinêre, ji ber ku evîn şadî û zelaliya henasa mirovahî ye, yê di xwezaya xwe de meyladarê karê baş û hezkirina azadiyê ye, ji pileya pêbirina mirov ji taybetmendî û şanên yê ku ew ji sirûştê wergirtî distîne.

Mirovê zanyar hebûna sabar, netew û taybetmendiyên di jiyane de betal nake, ji ber ku binema yekbûna hebûnê cûrebûn e, û gelemperîbûna dîtinekê têknabe bi pêwîstî dîtîne li cûrebûn û dewlemendiya heyî a ku zanyar jê gelek pêkanînen xwe werdigre, lêbelê li cem zanyar armanca herî dawî heye yê ew bi xurtî pêdigre paş wê cûrebûn e û ewa hewildana ji bo zanîn û parastina hebûn ye, û liyangirtî nake ji ber ku zanîn bê sînor e, û dibîne li cûrebûna mirovî di ol, kom û nijad de wek taybetmeniyên ku bi guherîn, serdem, tevlihevûna zayend, û bandorbûna cîgehan li ser refarên koman ve darizandî ne, û li berdêl, çareserî û ramanên nû digere, û tu carî ji bo wana berz bike nakeve dudiliyê, û her digere û rastî zanyaran tê yê li hemî derên hebûna giştî de dijîn, hebûna a ku têgihîştina çêkerên sînor, erdnîgarî û qat derbas dike.

Mirovê zanyar nasnama xwe di zanîne de ye, ew di fêrbûna zimên de destikekê dibîne ji bo dan û standîne bi kesên yê di wana de rastiya wî ya nû û sermedî diyar

dibe, a banga xizmetkirina heyîn û pêkanîna nameya wê di hezkirîne de dike, li ser olekî an partiyekê an netewekê an xêlekê nasekine, bi rêxistina xwezayî ve bawer e, xwe nake koleyekî kirêgirtî di xizmeta tofêkê de bi xwe.

Mirovê zanyar li hember têgeha partîtiyê û qalibkirinê bi hemû pergalên wê şoreşger e, bi yekîtiyan re ye yê çêdibin ji bo binyadkirina nermbûnê di ramanbûnê de, û bi mirovê leşger û serok bi eynê demê ve bawer e, bi rexneyê ve tam bawer e, û têgehên gotubêj û guftoguyê bicî dike berve pêşvebirina raman û gihîştina tiştê herî baş, evîn û hunerên mirovî yê xizmeta hebûn û ramanbûna zanyarî dikin pîroz dike, û ji bona wan ji bo rêya pêgirtina zanîne kar dike, bi evîne wek rêbazekê ve girêdayî ye, û bi zanebûnê mîna armançek e bi dawî, û bi hebûnê weke hatinrêzekê ve.

Û evîn ew kargêrkirina sinc e yê nûnera yekm erkên mirovê zanyar di jiyane de dike, ji ber ew nûnera netew û hezkirina wî ji jiyane re dike.

Lidûhevhatînen hêz û tundiyê di mirov de balatir raberî û agehên wî fetisandibûn, û wî hîştibû ku bikuje ji bo ku ziyar û pîsiyên xwe bi dû xwe ve bihêle, li hebûna a dibe penageyekê ji ber dewamiya jiyane re.

Û wisa têgehên wêranî û xerakirina ramanê belav bûn, û bûn e alavekî ji sexetebûna rastiyan û listina bi baweriyên ve.

Ev kevirbûn hîşt mirov darjêge, û mûmyabûyî be û nikaribe zanîne têbigihe, û yek ji erkên mirovê zanyar a rasteqîn e ewa jinavbirina hişmendiya tund û tûjîyê ta negihe gendelî, zordarî û ketina di xefkên têgehên teng de yê dijatiya nixên evîn, zanîn û roniyê dikin.

Zanîn liyangirtinek e bêsinor e ji evîn û bedewiyê re, û nevētinek e ji kedxwarî û dîrxistinê, û rizgarkirina mirov ji her tiştê ku wî tengav dike an dibe kelem pêş pêvajoka wî ya berepêş bi rêya peyrewîkirina wî bi sinc ve, û bikaranîna wî ji hiş re û karxistina wî ji kanîne re di xizmeta nixên ku bi hebûnê ve girêdayî, û nix jêderê xwe ji hogirbûna hiş bi zîzbûn ve ye di nav heyînê de.

Yek ji armançên zanîne di hebûnê de ewa berzbûna hevjiyan, jîrbûna bala û lêborîne di çarçoveya cûrebûna mirovî de, û geşkirina wê bi hevkarî, hezkirin, û qamkirina jiyane bi rêya xebat û sazgehê. ■

NAMEYEKE DÎROKÎ YA MISTEFA BARZANÎ JI JOHN F. KENNEDY SEROKÊ AMERÎKA RE



Zanyar Qirgeyî

Nivîskar û arşîvkar,
Başurê Kurdistanê




Generalê çiyayan, rêberê şoreş û aştiyê Mistefa Barzanî, serkirdeyê herî geş ê dîroka tevgera azadîxwaziya kurd û Kurdistanê, bi navê berevanîkirina li mafên kurd û Kurdistaniyan, bi navê pêkanîna xewna mezin a xwe û gelê xwe, wekî çawa şoreşa çekdariyê destpê kiriye, wiha jî herdem ji bo çareserkirina aştiyane ya doza rewşa ya neteweya xwe, hem hewla aştiwxazane daye û hem jî amadeyê hemû guftûgo û danûstandinek bûye.

Barzanî, her dema ku gihîştibe wê baweriyê ku êdî hewlên aşti û çareseriyên aştiyane pêk nayên. Paşê hêviya xwe ji bo şoreş û xebata çekdariyê bîriye û herî zêdeyê temenê xwe bi Pêşmergeyên xwe re li çiyayên Kurdistanê de derbas kiriye. Barzanî ne dev ji doza mafên Kurdistaniyan berda û ne jî serê xwe ji bo hiç dijmin û dagîrkerek tewand û ne jî rojek ji rojan xwe bi dest da.

Yek ji wan belge-nameyên herî girîngên helwesta aştiwxazaneya General Mistefa Barzanî, nameyeke girîng e ku 61 sal berê û li 12.07.1963 an de ji bo John F. Kennedy Serokê wê demê yê Dewletên Yekbûyî yem Amerîkayê(DYA) re şandiye.

Berî çendîn salan, Dr. Ebdulrezaq Ferhadî di dema pişkinîna hinek malperên taybet da, hinek belge-nameyên di derbarê kurdan de yên gelekî girîng peyda kir û ji îhmal kirin ji bîr kirina arşîvaxaneyan rizgar kirin. Yek ji wan jî ewe ku girîngiyeke dîroki ji bo kurd û xelkê Kurdistanê heye. Ev nameya Mela Mistefa Barzanî ye ku li sala 1963 da ji bo John F. Kennedy re şandiye û têda daxwazê dike: Serokê





Amerîka, şîyan û karîn û desthilata xwe bikarbîne da ku êdî xwîn li navbera kurd û rejîma wê demê ya Iraqê da nerije.

Barzanî wê demê li rêya Balyozxaneyê Amerîka ya li Tehranê re, bi zimanê Farisî û bi nivîsîneke xweşik a gelek dîplomatîk, nameya xwe ji bo Serokê Amerîka re şandiye. Di beşekê de nivîsiye: "Ewê em daxwazê dikîn, kêmtirîn mafê mîlletê me ye ku otonomiyeke li çarçêweya Komara Iraqê da."

Barzaniyê Nemir di nameya xwe de balê dikşîne li ser wê yekê ku ji bilî danustandina bi hikûmeta nû ya piştî darbe û kudetaya 8ê Sibata 1963yan ku Hikûmeta Iraqê wan hemû sozên xwe bînpê kirin ku li bin sondê da hatine mohr kirin û mehek zêdetire mijûlî bombebaranên berdewam û dirindaneyê li dijî Kurd. Bi awayekî hîtleriyane û faşîstane siyaseta şewitandina zeviyan li ber girtiye ku rastiya wê şerm û hetikbirineke mezine ji bo mirovayetiya li vê sedsala bîstem da."

Li dirêjahiya nameya ji bo John F. Kennedy Serokê Amerîka re, Barzanî nivîsiye: "Îro mîlletê kurd bi çaveke pir bi hêviyê ve daxwazê ji cenabê we û xelkê bi şeref û azadî dostê Wilayetên Yekgirtî dike, ji ber xatirê ruhê demokrasî û mirovayetiya Amerîkî, gelek bi şîyanê ve palpiştîyê li Kurdê Iraqê bikin ji bo pêkanîna mafên wan ku pêkhatiye ji otonomiyeke li çarçêweya Komara Iraqê da. Em vê daxwazê dikîn, ji bo ku rê li xwînrijandinê bigrîn û wê dîwara zulmê nehêlin ku li ser kurdan de heye."

Her wiha nivîsiye: "Em hêvîdar in ku cenabê te ji bo dawî anîna vê rewşê, bandoreke şexsî ya xwe û mîllî ya Amerîkayê bi zûtirîn demê de bi kar bîne. Eve rûpelekî din dixê ser dîroka serweriya xelkên serbilind û demokratîkê welatê we."

Ev nameya girîng û dîrokî ya General Mistefa Barzanî ya ji bo John F. Kennedy ku wekî dokumentek li (Pirtûkxaneyê Kongresa Amerîkî - Beşa Belgenamayan) de hatiye parastin, nîşana wê rastiya tehl e ku rejîmên yek bi yekên Iraqê, bi paşayî û bi komariyan ve, bi serbazî û bi efendiyan ve, bi bê cûdahiya îdeolojiya û ol û mezheban ve, bi qat li ber (taxim û krawat li ber) û egal li ser û emame bi serê wan ve, nexwestine û naxwazin mafên kurd û Kurdîstaniyan bidin.

Rejîmên Iraqê, her dema lawaz bûbin daxwaza danûstandinê li kurdan kirine û her dema bihêz bûbin, dest bi kuştina kurd û wêrankirin û dagîrkirina axa wê kirine.

Ev nameya girîng û dîrokiya General Mistefa Barzanî ya ji bo John F. Kennedy, wê rastiye nîşan dide ku serkirde û rêbereke wekî Mistefa Barzanî, baş bi başî zaniye ku di wê serdemê de jî, otonomî mafê tevahiya kurd nebûye belkî dewleta serbixwe mafê kurd e. Lê belê wekî ku li nameya xwe da nivîsiye: Ji bo wê qonaxê ji bo rêgiriya li xwînrijandina zêdetir, kurd daxwaza otonomiyeke li çarçêweya Komara Iraqê da dike ku kêmtirîn mafê wî ye.

Di derbarê hizr û bîra aştxwazaneya Barzanî, François Xavier Lova nivîsiye: "Barzanî, li wê dema ku li şer da jî bû, hez nedikir, xelkek dijminê wî jî bikuje."

Aleksander Kisliyov Berpîrsê Saziya Hewalgiriya



دن ل ده‌رفه‌ی وه‌لات ل دیاسپورایی ته‌نها
دینه‌ جه‌ژن و خو‌شی ب مۆزیک و گو‌فه‌ند
ل سالونا بیی رێورسیم.

■ هه‌ر سال ب خێر و خو‌شی بن.

سەرسل ئافراندا کنیات و سروشت و بە دەوێ یە



نادر دۇغاتی
نووسەر، ئەلمانیا

سەر خورە قەبۆل ناکەم، لەورا د مەها نیسانیدا پێکیناننا
هەژنیی (زەواجی) د نای ئیزدیاندان ناییت و گونەهە،
وهرهوسا جۆتکاری و کولانا زەقیی ژێ گونەهە.

ل چارشەمبووی خۆش بوو ژیان

کەسک بوون دەشت و چیا و زەفی و زۆزان
هەموو ب کەرەما بەدشی منی ئیزدان

ل ئیشارا چارشەمی ئانکوو سێشەمە ئیشاری، فندک
و مۆم وشەمال ل هەموو مەزارگەها و جەین پیرۆز تین
ئیخستین و ب تاییەت ل پەرستگەها لالش یا تۆرانی
ب دەستین فەقرا و مەجپور و سەردەرین قۆب و مەزەلین
خاسا.

هەر مالە ئیزدی د فی پۆژیدا دفتت هەزارە مەزن
هیکارەنگاوەرەنگ بەکەلینین (واتەیا هیکتی، یەزدانی
مەزن کنیات ژ دوری ئافراندا بەرنگی هیکتی و رەنگدانا
هیکارەنگاوەرەنگ و شکاندانا هیکتی ئانکوو ئافراندا
کنیاتیە) و نانێ (سەۆک) ب روون و کونجیا دپێژن و
هەر مالە ل گۆر پێچیبوونا خوە سەرپەرەکی د کەن نەدر
و سەر ژێ د کەن، ژ بو مالتین فەقیر و کیمدەرەمەت زاد
و سەۆک و هیکارەنگاوەرەنگ خیر و بەلاف د کەن.

دفتت هەر مالە د فی پۆژیدا بەر دەریی مالا خوە

سەری سالا ئیزدیان (سەرسل) یان ژێ (چارشەمە
سەری نیسانی) د کەفتە یەکەمین چارشەما سەری مەها
نیسانا پۆژەلاتیدا، هەرسل گەلی ئیزدی د فی پۆژیدا
سەرسل خوە پیرۆز د کەن، د بیروباوەریا ئیزدیاندان
مالتیکەت (تاووس مەلەک) د فی پۆژیدا داھری ئەردی
بوویە ل لالشی (ل گۆر میتۆلۆژیا تۆلا ئیزدیان) کنیات
و سروشت خەملا ندین ب جوانی و بەدەو و کولیلکین
مەها نیسانی یین سۆر، وەکوو د فی سەبەقا قەولیدا
دیاردکەت:

پەدشایە و هەرەفت یارە،

ل مەرکەبی دبوون سوارە،

د سەیری ل چار کناوە،

ل لالشی سەکنین گۆرتن ئەفە حەق واره.

مەها نیسان دپێژە ئەز بووکا سالتیمە و ئەز چ بووکا

ب قەفتکە کۆلیلکین سۆر یین مەها نیسانی و قالکین
هیکارەنگاوەرەنگ بەخشین. ئەو نیسانا کوو ئەف
مال مالا ئیزدیانه.

چارشەم پۆژە ک ب خودانە

دیژمە وە گەلی ئیزدیانه

تاووس مەلە ک ژ مەرا شەھدە و ئیمانە.

زارۆک دەستی دای و بافی خوە ماچ د کەن و جەژنا وان
پیرۆز د کەن، دای و بافی ژێ خەلاتی وان د دەنی.

کەچ و خۆرت سەردانا مالتین دۆست و هەفال و
کەسوکارین خوە د کەن و جەژنا هەف پیرۆز د کەن، دۆرا
دەست ب لەهیسەتکا هیکارەنگا د کەن (دەق و دەق) و هەر
کەسێ هیکارەنگا هەفالی خوە بشکینە (سەرۆبن) دئ هیکارە
شکەستی ژخۆرا بێ، زارۆک گەلەک شاد دبن دەمی هیکارەنگا
بەپێز هەبیت و گەلەک هیکارەنگا بشکینە و ژخۆرا بێت.



دایک و کابانین مالتی خوارنن فولکلوری ئامادە د کەن
و هە تپشک (کۆتلک) و سەرۆبن و ئاپراخ.. هتد.

پشتی خوارنا نیفرۆژی جۆتکار سەرەدانا زەفی و
باخچین خوە د کەن، نانێ سەۆکی و هیکارەنگا پەنگین ب
خورا د بن و لئاف زەفی و چاندنیا خوە هیکارەنگا د شکین

سەری سبەهی دگەل پۆژەلاتیدا مالتین
مالتی دگەل زارۆکین خوە بەری خوە د دەن مەزارگە
و پەرزەگەهین تۆلی و سەرەدانا گۆرستانا د کەن، دوست
و هەفال و خزم و گوندی بەرف هەف د چن ب سلاف و
خورمەت، جەژن و سەرسلاتا تازە ل هەف پیرۆز د کەن،

نهجمه دین غولامی:

له هه نده ران ههستی نه تهوهیی زیاد دهکات

ههستی



شوین و یادگاریی سهردهمی مندالی و لاوی و هاورپی و که سوکاریه تی، ”چه ندين ساله له هه نده رانم، ئیستاش دلم هه ر له ولاتی خۆمه“.

دوای رووخانی دهسه لاتی شاهانه له ئیران له سالی ۱۹۷۹ و هاتنه سهر کاری کۆماری ئیسلامی، نهجمه دین غولامی رووی له شاخ کردوو و وهک پیشمه رگه و هونه رمه ندیك، خهباتی بۆ نه تهوه که ی کردوو و چه ندين گۆرانی و سروودی شۆرشگێری تۆمار کردوو.

ئهو هونه رمه نده ی رۆژه لاتی، دهستپیکاری کاره هونه ریه کانی له باشووری کوردستان له گه ل تپیه موسیقییه کانی بابان و رواندز تۆمار کردوو و ئهو قۆناغه ش ”وهرچه رخانیک“ بووه بۆ کاروانی هونه ریه ی خۆی و میوزیککی کردی.

نهجمه دین غولامی جهختی له وه کرده وه، هه موو مرۆفیک کاتی له خه لک و نه تهوه که ی داده پرسی، ههستی نه تهوه یی زیاد دهکات. ئهو ئیستاش که له هه نده ران دهژی، سووره له سهر خهباتی نه تهوه یی و ههسته نه تهوه ییه که ی نهک کهمی نه کردوو، به لکو زیاددی کردوو و به رده وام له ئاههنگه کانیدا له ئه وروپا، ئه مریکا، ئه وسترالیا و که نه دا سروود و گۆرانییه شۆرشگێری و نه تهوه ییه کان ده لیته وه.

غولامی ئاشکراشی کرد، دواین کاری هونه ریه بریتیه

هونه رمه نده ی ناسراوی کورد نهجمه دین غولامی، باس له وه دهکات، مرۆف کاتی له ولات و نه تهوه که ی دوور ده که ویته وه، ههستی نه تهوه یی زیاد دهکات.

نهجمه دین غولامی له لیدوانیکدا بۆ (ره وه ند)، ئامازه ی به وه کرد، له شاری سنه له رۆژه لاتی کوردستان دهستی به کاری هونه ریه کردوو، کاره کانی ئه وکاتی له کۆمپانیای کانی تاران به رهه م ده هینا و له که ناله کانی سنه و کرماشان پهخش ده کران.

نهجمه دین غولامی له سالی ۱۹۵۸ له شاری سنه له دایک بووه، له ته مه نی لاویتییه وه دهستی به کاری هونه ریه کردوو. ئهو جگه له هونه ر، وهک پیشمه رگه یه کیش به گۆرانی و سروودی شۆرشگێری، خزمه تی ولات و نه تهوه یی خۆی کردوو.

غولامی خۆشه وستی خۆی بۆ سنه دوویات کرده وه و باسی ئه وه ی کرد، هه ر مرۆفیک شوینی له دایک بوون و زیدی خۆی پینخۆشه. بۆ ئه ویش سنه هه م زیده و هه م

له شه ش کلیبی نوئی، که له لایه ن کۆمپانیای بایلۆن له هه ولیر به رهه م هینراوه و یه کیک له گۆرانییه کان بۆ سلیمانیه و بلاوکراره ته وه، یه کیککی دیکه ش بۆ رۆژی خۆشه وستی (فالانتاین) ه و له ناوه راستی مانگی ۲ ۲۰۲۵ بلاوی ده کاته وه.

نهجمه دین غولامی هۆکاری مانه وه ی دهنگی وهک خۆی و که شخه ییه که ی، ئه گه رچی ته مه نی به ره و شهسته کان هه لکشاره، بۆ گرنگیدانی به خۆی و دهنگی گه پرانده وه و رایگه یانند: ”من مۆلکی خۆم نیم، سامانیکی نه ته وه ییم، تا ئه و رۆژه ی بمیتم ده یی خزمه تی نه ته وه و نیشتمان که م بکه م، له به ر ئه وه وه رزش ده که م و هه رگیزیش جگه ره م نه کیشاره“. قسه ی هه واده کانیسه که به رده وام پیتی ده لێن ده نگت نه گۆراوه، به ”نیشانه ی خۆشه وستی“ ی ئه وان ده زانیته.

له باره ی کاری بیژه ریه وه، که دوو هه فته جاریک به رنامه یه کی هونه ریه و ئه ده بی له ئاریان تیقی (نه وروژ تیقی پینشتر) هه یه، رایگه یانند: له سوید کاتی زۆری هه بوو، به پرتیه به رانی ئه و که ناله ش داوایان لیکردوو به رنامه یه کی هونه ریه یان بۆ بکات و ئه ویش رازی بووه تا وه کو له و رینگه یه وه ش خزمه تی نه ته وه که ی بکات.

غولامی به دل پیتی خۆشه و ئاواتی ئه وه یه بگه ریته وه رۆژه لاتی کوردستان، به لام به و مه رجه ی ”به سه ربه رزییه وه“ بگه ریته وه. ئه وکاتیش یه که م کاری ئه وه ده یی که ده چیته سه ر گه لکۆی شه هیدان، ئه و شه هیدانه ی ”له پرتی گه ل و نیشتمان و ئازادی و دیموکراسی و مافه کانی گه ل گیانیان به خت کرد“، دواتریش چه ند کۆنسیرتیک له شاره کانی رۆژه لاتی ساز ده کات، چونکه ”ئهو خه لکه به تاییه ت بنه ماله ی شه هیده سه ربه زه کان، ساله هایه تامه زرۆی ئه وه ن من له نزیکه وه ببینن“.





به لَام من چيگه نه گه ره کما وه ئی ئانه ی پاگیر که رمی سه رو ئانه ی که ویستمانه و به ویستی گشتیش مزانمی . گرنگا باستی و یما که رمی و ویماره بلمیوه ، ئیمه و خه لک و هۆرامی ئه گه ر ئاماده باشی پیوستما نه بوو ئه گه ر و یما به رنه وزمی و به و به زمانه که یما نه می و زینه ی ئی زمانه ی پیسه ویش بازمی و زیاته رش که رمی .

وهختی روشنبیرا و نووسه را ئی ناوچه یه که وتینه ویشا و زمانه که شا ئارده نه وه مه یان و روح و ئه ده بیاتیشا جارپه تهر که رده نه وه وهر ، ئه گه ر پۆنامه و گۆفار و کتیبه کوردیه کی که وتینه ئانه ی .

به گه رمی بابته به زمانو هه ورامی بلاوکه راهه نویسه ر یجما به نویسته ی هه ورامی و وه نه ره کیما هه ست پانه یه که را که به ئی ئانا زمانو هه ورامی ئاماره سه رو پراو راسته قینه و ویش و ئاوه خته به بی ئینه ی داواکه ری و گله ی و مانگیری و سه رش بنویسمی و که سیج گوشت په ی نه گیرو ئا کاته ویشا چ ده سه لات و دنیایی ئه ده بی و یاسا پیسه واقعیوه مینه وه رۆو ناچار قبول کریو ، چونکه تو ویت سه لماند ، ویت بهر وست که به شیوه گرنگ ویت وزینه ئا ئاسته ی که پیوسته نی و به بی توو ئی زوانه که م وکورتیش هه نه ن .

ئاکات کریو جه ده ستورو هه ریمی چه نه په ی ئاینده ی هه رمانه ش سه رکریو ، به جووری جه مه کته به کانه ئی زوانه وانیوو ، دما ته ر بوو به هه نگامپه وه په ی ئاسانکاری دروست بیه ی زمانپه وه یه کگرتوی کوردی .

چیگه نه کریو هاوکاری و پیوه دپه ی نه مه سه له کا په یما هه نگامپه وه گرنگا و سه ره تپه ون په ی یاواینه سه رو ریو بنه ماو کارکه رده یما تا ئازه مه نه وه شکریو ئیمه و خه لکو هۆرامانی ئا ده ستکه وته ئه ده بیه په روه رده یا به ده ست به یا و ئی زوانه جه نه مه نه یوو سه ریو رژگار ش بوو ، به دلنیا یۆ هامکاری که رده یی بلاوکه راهه کا یان هاندایی په ی نویسته ی و ئیسه چ گووارو په وه ندی هه نگامپه ون په ی کارکه رده و به روسته ی زیاته ری زوانو هۆرامی ، ده رفه تی

پیوه ده ست به هه رمانی که رمی ، چونکه هۆرامان و زوانو هۆرامی و ره سه نایه تی ئی ناوچه یه پیوستش پانه ی هه ن هه رمانه ش په ی که رمی .

مه ممه ده ئه بولقاسم ناسریان به (مه لا په ریشان) جه دینه وه ر و کرماشان ئامان دنیا (۱۳۵۶ - ۱۴۲۱) زاینی ژیان ، به «مه لا په ریشانی دینه وه ری» ، «مه لا په ریشانی کورد» و «مه لا په ریشانی له ک» یج ئه شناسیان و جه چوارچیوه و شعرئ ئاینینی یارسان بیه ن و یوون جه شاعیره سه ره تاییه کا زوانو هۆرامی . ■

خاسا په ی ئیمه ی نووسه را هۆرامانی که به شیوه سسته میانه کارش په ی که رمی جه راو نویسته کاماره ئامانجه کاما پیکمی ، چونکه ئارۆ نویسته ی به زمانو هۆرامی و قسه که رده ی چه نی خه لکو هۆرامانی چی ریوه کاریوه ئاسان ته رو ریوه نریک ته ریچه نه یاوناو مه به ستی تا تاومی گرما پیوه جه خالیوه نه یوگیری و



دەستپەردان: مايكرۆسىستەم لە پروانگەى سۆشەل سايكۆلۆژىيەو نزيكترين ژينگەى كۆمەلايه تىي دەوروبەرى مرۆفە. ئەمە پەيوەندىيە راستەوخۆكانى گەنجان لەگەل خىزان، ھاوړى، قوتابخانە و شوڤنى كار دەگرېتەووە كه كارىگەرئىيان لەسەر تېروانىن و گەشەكردنىان هەيه. ئەگەر ئەم مايكرۆسىستەمە بە باشى كاربكات، يارمەتيدەر دەييت بۆرېنمايىكردنى گەنجان بۆ دووركەوتنەووە لە ماددە ھۆشبەرەكان و دروستكردنى كۆمەلگەيهكى باشتر كه تىيدا گەنجان ئاسودەيى بۆ خۆيان بدۆزنەووە. بە پىچەوانەووە، كارنەكردنى باشى سيستەمەكه ئالنگارى و مەترسى لەسەر داھاتووى گەنجان دروست دەكات.

تيۆرى وابەستەبوون و خۆپاراستن لە ئالوودەبوون:

سۆشەل سايكۆلۆژى جەخت لەسەر تيۆرى وابەستەيى ”جۆن بۆلېي“ دەكاتەووە كه تېروانىنيك بۆ كردهى خۆپارېزى دەكات.

ئالوودەبوون چەمكىكى مەترسیداره و پىويستە گەنجان لە چەمك و دەرئەنجامەكانى تىيگەن. بۆ خۆپارېزى و دووركەوتنەووە، پىويستە يارمەتى گەنجان بەدرېت لەرېگەى:

خولى ھۆشيارى و نيشاندانى مەترسىي ئالوودەبوون و وابەستەيى. رېكخستنى سيستى سۆزدارى و ئاسودەيى خود. بەھيژكردنى كۆنترۆلى عەقلانى كه ژيرمەندى كارىگەرتر بيت لە سۆز. گەشەپىدانی دەروونى و ھاوسۆزى. دەستنيشانكردنى شىوازی بيركردنەووەى ناكارامە و دارشتنەووەى گریمانەكان. پەرەپىدانی ستراتىژىيەتى پرووبەروبوونەووەى گونجاو.

دەرئەنجام:

تيۆرىيە سۆشەلسايكۆلۆژىيەكان روونى دەكەنەووە كه چۆن ھەرزەكاران لە چاودىرى و لاسايىكردنى رەفتارەكاندا

ئالوودەبوون و پاراستيان هەيه. سايكۆلۆژىيەتى گەنجان وایان لیدەكات حەز لە تاقىكردنەووەى شتى نوئى بكەن و چيژ لە شتى نەزانراو ەربگرن. گەنجان چاودىرى رەفتارى بەكارھيئەرانى ماددە ھۆشبەرەكان دەكەن و لاسايان دەكەنەووە، بە تاييەتى كاتىك ەك سەرچاوەى چيژ و خۆشبەختى باس دەكرين. كارىگەرى سۆشيال ميديا، كه گەنجان زۆرترين بەكارھيئەرين، ھيژى زياتر بەو تيگەيشتنە دەدات كه لاسايىكردنەووە و تاقىكردنەووەى ماددەى ھۆشبەر كارىكى دروست و چيژبەخشە.

پروا و خۆكارايى:

گەنجان پروايان وايە ماددە ھۆشبەرەكان دەتوانن يارمەتییان بدن لە پرووبەروبوونەووەى ئالۆژىيەكانى ژيان و دۆخە كۆمەلايه تىيەكان. خۆدزىنەووە لە قۆناغە ئالۆزەكانى ژيان و كەمبوونەووەى پروا بە ستراتىژىيەكانى پرووبەروبوونەووەى خەم و نارەحەتى، وایان لیدەكات ئەم رېگايە ەك بەديلىك ببين.

تيۆرى ناتەبايى مەعريفى و بەكارھيئەتى ماددە ھۆشبەرەكان:

بەپيى تيۆرى ناتەبايى مەعريفى ليۆن فيستينگەر، ھەرزەكاران پاساو بۆ بەكارھيئەتى ماددە ھۆشبەرەكان دەھيئەنەووە و ەك شتىكى ئاسايى پەيوەست بە خۆشبيەكانى ژيان دەبيين. ئەوان تيگەيشتنىكى كەميان ھەيه لەووەى ماددە ھۆشبەرەكان دەتوانن ئالوودەبوون دروست بكەن و داھاتوويان لەناوبەن. گۆرپنى ھەلوپست و دۆزىنەووەى زانىارى پشتگيرىكەر بۆ بەكارھيئەتى ماددەى ھۆشبەر، وا دەكات ھەستياريان بەرامبەر دەرئەنجامە نەرئىبيەكان لاواز بيت.

بەشى سىيەم:

ديدگا كۆمەلايه تى-ئىكۆلۆژىيەكان سەبارەت بە

سايكۆلۆژىيەتى گەشەسەندنى مەعريفى و ھەلسەنگاندنى مەترسى: گەنجان تا دەرنگانى ھەرزەكارى، لايەنى عەقلانىيان تەواو گەشەى نەكردووە. توانای پلاندانانى دريژخايەن و ھەلسەنگاندنى مەترسىيەكانيان لاوازه. بيركردنەووەيان زياتر لە ژيژ كارىگەرى سۆزدارى و فەزاي دەوروبەردايە نەك تيگەيشتنى مەعريفى.

بەشى دووهم:

پروۆسى فيربوونى كۆمەلايه تى و چۆنيەتى ھەلسوكەوت لەگەل ماددە ھۆشبەرەكان مۆديل و فيربوونى لاسايىكردنەووە و چاودىرى:

تيۆرىيەكانى فيربوونى كۆمەلايه تى ئەلبيرت باندوورا پەيوەندىيان بە تيگەيشتن لە چۆنيەتى فيربوونى رەفتارى



تېروانىنىكى سۆشەل سايكۆلوژيانە لەمەر بەكارهينانى ماددە ھۆشبەرەكان لە نيو گەنجاندا

پەيوەندى كەسەكان لەناو گرووپدا گرنىگ دەبىت، بەتايىت ئەگەر يەكېك لە گرووپەكە بەكارهينەرى ماددە ھۆشبەرەكان بىت، چونكە دەتوانىت بىتتە ھۆى بونىادنانى ناسنامەيەكى نوى.

ياد ئەمىن
تويژەر



بەشى يەكەم :

پۆلنىكردن و پەيوەندى و خۆدۆزىنەوہ:
گەنجان خۆيان و ئەوانىتر پۆلنى دەكەن بۆ گرووپى جياواز. بەكارهينانى ماددەى ھۆشبەرەك نىشانەيەك بۆ گرووپ كاردەكات، ھىز و دەسەلاتيان دەردەخات. ئەمەش وادەكات ھەندىك گەنج سەرسام بن و شانازى بە شوپىنكەوتنى ئەو گرووپانە بكەن. ئەم بەراوردكردەنە كۆمەلايەتتە كارىگەرى لەسەر وپنەى كەسى و شوناسيان ھەيە.

يەكسانىي و تۆرمەكانى گرووپ:

تويژىنەوہكان دەرىدەخەن گەنجان دووچارى فشارىكى زۆر دەبن بۆ گونجاندى خۆيان لەگەل وىستى گرووپەكە، بەتايىت لە گرووپى بەكارهينەرانى ماددە ھۆشبەرەكان. پىنگەى كۆمەلايەتى كەسەكان پەيوەستە بە ئەزمونيان لەگەل ماددە ھۆشبەرەكان. ھەرچەند زياتر وەفادار بن بۆ گرووپەكە، مەترسى دەركردنيان كەمتر دەبىت.

ئەلبىرت باندىورا سەبارەت بە شوناسى خود دەلپت، كاتىك تاكە كەس كۆنترۆلى پالئەرهكانى لەدەست دەدات و خۆى لەگەل تۆرمە كۆمەلايەتتە زيانەخشەكاندا دەگونجىتت، تواناى بىركردنەوہى پەرخەگرانە و مامەلەكردى بەرپرسيارانەى تىكەچىت.

بەكارهينانى ماددە ھۆشبەرەكان لە نىوان گەنجاندا دياردەيەكى باوہ كە كارلىكىكى ئالۆز لە دەروونى تاكەكاندا دروست دەكات و فاكترى سەرەككە بۆ دارمانى پروسەى كۆمەلايەتى. مامەلەكردن لەگەل ئەم دياردەيە پىويستى بە تىۆرە سەردەمىيەكانە بۆ تىگەپشتن لە ئالۆزىيەكانى.

بەما سەرەككەكانى دەرووناسى كۆمەلايەتى جەخت لەوہ دەكەنەوہ كە چۆن فەزا و دەوروپەر كارىگەرى لەسەر ھزرى مرۆفەكان دەكات. تىۆرى شوناسى كۆمەلايەتى كە لەلايەن ”ھىترى تاجفىل و جۆن تۆرنەر“ دامەزرانە، تىگەپشتىنكىمان پىندەبەخشىت كە چۆن گەنجان لە پەيوەندى لەگەل گرووپە جياوازەكاندا ناسنامەى خۆيان پەرەپىندەدەن. بەتايىتەى لە كاتى ھەرزەكارىدا،

گه‌رانه‌وه‌ی دووهم بۆ کتییخانه و دیلی وشه

دارستانه گه‌وره‌کانی کهندا بیروه‌وشی داگیر ده‌کهن و، ئەمریکا رەت ده‌کاته‌وه و داوای چوون بۆ کهندا ده‌کات.

دوای ۱۱ مانگ له ژیاپتیکی سهخت و گیرفانیکی نیمچه به‌تال، دواجار وه‌ک خۆی ده‌لێت؛ په‌نابه‌ریکی به‌چانس بووم، کهندا ده‌رگای لێک‌دینه‌وه و له‌ رۆژه سارده‌کانی مانگی به‌فرانبار له‌گه‌ل ه‌اوسهر و سێ منداله‌که‌م گه‌یشتینه شاری ئیدمنتۆن له‌ کهندا. دوای گه‌شتیکی درێژ له‌ رۆژه‌لاته‌وه بۆ رۆژئاوا، دووباره ژیاپمان له‌ سفره‌وه ده‌ستپێ کرده‌وه.

کهندا.. لوتکه‌ی گه‌یشتن به‌ ئەده‌بی جیهانی!

”قسه‌که‌ی مامۆستای جوگرافیا راست ده‌رچوو، خۆ له‌ کهندا داره‌کان له‌ مرۆقه‌کان زیاترن”. جه‌لال به‌رزنجی واده‌لێت، زیاتر ده‌شلێت ئەوه‌ خۆشه‌ویستی بوو بۆ ژیاپ وایکرد ههم بسازی له‌گه‌ل کلتوری نویی کهندا و رۆژئاوا، هه‌میش له‌گه‌ل که‌شه سارده‌که‌ی که‌ هه‌ندیکجار پله‌کانی گه‌رما بۆ ۴۰ پله‌ی ژێر سفر داده‌به‌زن.

کهندا بۆ به‌رزنجی ته‌نیا ئەزمووینیکی نویی ژیاپ نییه، به‌لکو ده‌رفه‌تیکی زێڕینیش ده‌بیت بۆ نووسینه‌وه‌ی رۆژگار ره‌شه‌کانی سه‌رده‌می حوکمرانی به‌عس و، ده‌رگایه‌کی گه‌وره‌ش ده‌بیت بۆ چوونه‌ناو دونیای ئەده‌بی جیهانی و به‌ده‌سه‌پتانی ده‌یان خه‌لاتی جیاواز و، بوون به‌ ئەندام له‌ چهندان رێکخراوی ئەده‌بی جیهانی و که‌نه‌دایی، له‌وانه‌ خه‌لاتی نووسه‌ری یه‌که‌می تاراوگه‌ له‌ ۲۰۰۷، ئەندامبوون له‌ رێکخراوی نووسه‌رانی جیهانی، سه‌ندیکای نووسه‌رانی ئەلبێرتا، کۆمه‌له‌ی شاعیرانی کهندا، بوون به‌ خاوه‌نی پرفرۆشترین کتیب.

پوخته‌ی ده‌قی نووسینه‌که‌ به‌ ده‌ستنوسی به‌رزنجی خۆی له‌م مآله‌په‌ری ره‌وه‌ند بخوینیه‌وه. ■

دوای نزیکه‌ی ۲۰ سال، بینای کتییخانه‌ی گشتی هه‌ولێر ده‌کریت به‌ باله‌خانه‌ی دايره‌ی ئەمن، ئەمجاره‌یان به‌رزنجی وه‌ک خۆی باسی ده‌کات له‌سه‌ر وشه‌که‌له‌پچه ده‌کریت و، به‌ چاو به‌ستراوه‌یی راپێچی یه‌کیک له‌ ژووره‌کانی کتییخانه‌ی ده‌که‌نه‌وه.

به‌رزنجی، دیمه‌نه‌کانی زیندان و چیرۆکی ژیاپکردنی ناچاری له‌ ژووریکدا که‌ شوینی ته‌نیا پانزه‌ که‌سی تیدا ده‌بووه و ده‌سه‌لاتی به‌عس شه‌ست که‌سیان تێپه‌ستاوه که‌ هه‌ر زیندانییه‌ک ته‌نیا ۳۵ سانتیمه‌ری به‌رده‌که‌ویت، له‌ شیعریکدا تۆمار کردووه و، ده‌لێت؛ ته‌نیا خه‌ونه‌کانم و پروا بوون به‌وه‌ی رۆژیک دیت دیواره‌کانی زیندان ده‌پوخین، هه‌تیان پندام که‌ نزیکه‌ی ئەو دوو ساله‌ی جاری دووهم له‌ مآلی دووهم که‌ کتییخانه‌ بوو کرابوه‌ زیندان، که‌ ئەمه‌ خۆی له‌ خۆیدا دیمه‌تیکی تراژیدی و کۆمیدیه‌، بمیتم و نه‌که‌وم!

هه‌ناسه‌یه‌کی دیکه‌ی ئازادی به‌ تامی ده‌ربه‌ده‌ری!

رۆژگار تێپه‌رین.. راپه‌ڕینی به‌هاری ئازادی ۱۹۹۱ی باشووری کوردستان بۆ به‌رزنجی و زۆریکی دیکه‌ی نووسه‌ران دووجار ئازادی بوو، ئازادییه‌ک رزگاربوون بوو له‌ رۆژیمیکی دیکتاتۆری و ئازادییه‌ک نه‌جاتبوون بوو له‌ سانسۆر، به‌لام وه‌ک خۆی ده‌لێت؛ بۆ ئەوه‌ی نه‌بیته به‌شپک له‌ شه‌ری کورد له‌گه‌ل کورد، ”گه‌شتیکی دوور و درێژ و هه‌ستیارم کرد”.

به‌رزنجی، چاره‌نوسی خۆی و هاوژین و سێ منداله‌که‌ی ده‌داته ده‌ستی قاچاخچی بۆ ئەوه‌ی بگات به‌ ئەوروپا، به‌لام فیلی لیده‌کریت.

ئه‌گه‌رچی ئەمجاره‌یان نووسینگه‌ی نه‌ته‌وه‌یه‌که‌گرتوه‌کان له‌ تورکیا ده‌رگای به‌ختی بۆ ده‌که‌نه‌وه له‌ ئەمریکا، به‌لام



گوندنشینان هەر یەک بەلایه‌کدا پروات و نه‌گه‌پێوه.

به‌رزنجی هەر له‌و گونده‌ ئاشنایه‌تی له‌گه‌ڵ کتیب په‌یدا ده‌کات و کتیبخانه‌یه‌کی چکۆلانه‌ له‌ناو ده‌لاقه‌ گه‌وره‌کانی ماله‌که‌ی دروسته‌کات، لێ وه‌ک خۆی ده‌لێت؛ هەر گونده‌که‌مان و قوتابخانه‌که‌مان نا، به‌لکو کتیبخانه‌کانم و خه‌ونه‌کانمیشم سووتان!

”له‌ هه‌ولێر، نۆستالژییا له‌ دایک و باوکم نه‌ده‌گه‌را بینه‌ شاری، به‌لام منداڵ زوو له‌ گه‌ڵ ده‌ووربه‌ری ده‌گونجیت و ده‌بیته‌ به‌شه‌ک لێیان. من زوو خۆشیم له‌و شتانه‌ ده‌بینی که‌ له‌ شار هه‌بوون و له‌ گونده‌کامان نه‌بوون. له‌ شار ده‌ستم به‌ گه‌شتی فێربوون، دۆزینه‌وه‌ و خۆ پێگه‌یاندن کرد.“ جه‌لال به‌رزنجی له‌باره‌ی ده‌ستپێکی ژبانی شار واده‌لێت.

کتیبخانه‌ یان هه‌ستی نازادی!

یه‌کیک له‌ تایه‌تمه‌ندییه‌کانی خێزانی کورده‌واری له‌ کۆندا، گه‌وره‌یی خێزان بووه‌ له‌په‌ڕوی ژماره‌وه‌ که‌ که‌م خێزان هه‌بوون له‌ کورده‌واریدا زیاتر له‌ هه‌شت منداڵیان نه‌بیت!

خانه‌واده‌که‌ی به‌رزنجیش له‌مه‌دا بیه‌ش نه‌بوون، وه‌ک خۆی ده‌لێت؛ کاتیک له‌ قۆناغی ئاماده‌یی ده‌بخویند له‌به‌ر قه‌ره‌بالغی نه‌یتوانیوه‌ سه‌عی بکات بۆیه‌ به‌ ناچاری رووی له‌ کتیبخانه‌ی گه‌شتی کردوه‌ که‌ ئه‌و دم شوپنه‌که‌ی له‌ جێگه‌ی ئیستای ئه‌نجومه‌نی وه‌زیران بووه‌.

”کتیبی کوردی که‌م بوون، به‌لام عه‌ره‌بیه‌کان زۆر بوون.. له‌ کتیبه‌ عه‌ره‌بیه‌کان به‌ تایه‌تی وه‌رگێرداوه‌کانم ده‌خوینده‌وه‌.“ به‌رزنجی واده‌لێت، باس له‌وه‌ش ده‌کات که‌ هەر له‌م ته‌مه‌نه‌ بچووکدا کتیبه‌ ئه‌ده‌بیه‌کان زāl بوون به‌سه‌ر خوینده‌وه‌ی کتیبه‌کانی قوتابخانه‌، ئه‌مه‌ش وایکردوه‌ هه‌م له‌ قوتابخانه‌ نمره‌کانی دا به‌زێت و مامۆستاکان لێی بدن، هه‌میش دایکیشی نیگه‌ران بووه‌ له‌وه‌ی هه‌مووشۆی کتیبخانه‌ی کردوه‌ و که‌چی براده‌ره‌کانی به‌شتی تره‌وه‌ خه‌ریک بوون.

کتیبخانه‌ و خوینده‌وه‌ی کتیب دیدی به‌رزنجی فراوانتر ده‌که‌ن و، وه‌ک زۆرێک له‌ شاعیران و نووسه‌رانی کورد وایکردوه‌ چه‌زی بچیته‌سه‌ر نووسین و بکه‌ویتنه‌ ژێر کاریگه‌ری شیعری نوێی ئه‌وروپی که‌ وه‌رگێرداوه‌ سهر زمانی عه‌ره‌بی.



شار و قۆناغیکێ نوێ!

وه‌ک زۆرینه‌ی هاوگوندیه‌یه‌کان مالباتی جه‌لال به‌رزنجی شاعیریش به‌ناچاری بیه‌و بارگه‌یان بۆ هه‌ولێر گواسته‌وه‌، ئه‌مه‌ش یه‌که‌مین به‌رکه‌وتنی شاعیر ده‌بیت به‌ شاریکی گه‌وره‌ و جه‌نجال که‌ ئه‌و تیبدا نامۆیه‌ و هه‌یچ شاره‌زای کوچه‌ و کۆلانه‌کانی نییه‌.

”دایکم نه‌یده‌زانی هه‌ست به‌ نازادی ده‌که‌م و له‌پێگه‌ی وشه‌وه‌ دونیا ده‌دۆزمه‌وه‌، ژبان ئاوايه‌ زۆرجار که‌سه‌ نزیکه‌کانیش لیت تیناگه‌ن!“.

زه‌مینه‌ی سیاسی یان زه‌مینه‌ی له‌دایکبوونی یه‌که‌م په‌خشانه‌ شیعرا!

به‌رزنجی، له‌ له‌پێگه‌ی وشه‌وه‌ ئاشنای شاعیری فه‌ره‌نسی پۆل فالیری ده‌بیت و کاریگه‌ر ده‌بیت به‌

سانسۆر، یان دیوه‌زمه‌ی ئه‌دیپ و نووسه‌ران

مخابن هه‌ناسه‌ی نازادی زۆری نه‌خایه‌ند و رێککه‌وتنی ۱۱ی ئازار له‌لایه‌ن رژیمی به‌عس پشتی تیکرا، ئه‌گه‌ر ئه‌مه‌ له‌دیوه‌ سیاسیه‌که‌ی بۆ قه‌زیه‌ی کوردی رۆژگاریکی سه‌ختی هه‌تایه‌ پێشه‌وه‌، ئه‌وا بۆ نووسه‌رانیش له‌ دیوه‌ ئه‌ده‌بیه‌که‌ی سانسۆری (ره‌قابه‌)ی هه‌تایه‌ ناو کایه‌ی نووسین.

به‌رزنجی، هاوشانی زۆرێک له‌ نووسه‌ران ئه‌و سانسۆره‌



قه‌سه‌یه‌کی ئه‌و که‌ ده‌لێت؛ ”په‌خشانی شیعری برده‌ سه‌ما“، هاو‌ده‌م زه‌مینه‌ سیاسیه‌که‌ی ئه‌تمۆسفیری به‌یانی ۱۱ی ئازاری ۱۹۷۰، بۆ به‌رزنجی که‌ هه‌شتا قوتابی قۆناغی ئاماده‌یه‌ له‌ ئاماده‌یی کوردستان له‌ هه‌ولێر، ده‌بیته‌ ده‌رگایه‌ک بۆ بزوتنه‌وه‌یه‌کی ئه‌ده‌بی و رۆشنییری له‌ کوردستان، ده‌بیته‌ ژانی له‌دایکبوونی یه‌که‌م په‌خشانه‌ شیعری به‌ناوی (گۆرستانی قلیشاوه‌) و له‌ گۆفاری چوارچرا بۆلوی ده‌کاته‌وه‌.

بۆی ده‌بیته‌ دیوه‌زمه‌یه‌ک و ناهه‌یلت به‌ دلی خۆی وه‌ک بۆلبولیک له‌ناو به‌هار و گۆلزاری وشه‌دا بخوینیت و، سه‌رئه‌نجام دوا‌ی دووچار رێگریکردن له‌ بۆلۆکردنه‌وه‌ی یه‌که‌مین کۆریه‌ی شیعره‌کانی به‌ناوی سه‌مای به‌فرینی ئیواران له‌ ساڵی ۱۹۷۹، له‌ جاری سینه‌مه‌دا به‌ کۆمه‌لێک مۆری سووری مه‌منوعه‌وه‌ یه‌که‌م دیوانی چاپ ده‌کات.

”هەر مۆریکی پۆلیسی ئه‌ده‌ب و لابردنی چه‌ند پرگه‌ و په‌ره‌گرافیک، لای من برینی به‌شیک بوون له‌ هه‌ست و دزینی خه‌ونه‌کانم“. به‌رزنجی واده‌لێت.

جہلال بہرزنجی لہ گوندی ٹہ شکہوت سہقاوہ بۆ لوتکەى ئەدەبى جیہانى!

لەسەر دەفتەر نفووسى ھەردووکیان نووسراوہ (۷/۱) رۆژى
لەدايک بوونیەتی تێدەگات ئەو رۆژە تەواو نییە، بۆیە لہ
دایکی دەپرسیت: کەى من لہ دایک بووم؟

”گیا شین بیوو، مەرۆمالات لینیان تیر دەخوارد و گۆل
دەستی بە خونچە کردن کردبوو.“ دایکی وەها بەرسف
دەداتەوہ کە نە رۆژ، نە سالی تیدا نییە، بەلکو ئەمە
(سناپ شۆت)ی وەرزیکە، یان روونتر بلتین سناپ شۆتی
زۆرینەى ئەوانەن کە لہ تەسکەرەکیان نووسراوہ (۷/۱).

”با تۆش ئەزمونی من دووبارە نەکەیتەوہ“

”لہ ریگای چوون بۆ ناوونوسین باوکم گوتی: دەچین
تا ناوت بۆ گەشتی فیر بوون بنووسین. خیراکە کورم با
تۆش ئەزمونی من دووبارە نەکەیتەوہ.“ جەلال بەرزنجی
وادەلێت. یینگومان ئەمە یەکەمین ویتستگەى ژيانى جەلال
بەرزنجی بووہ کە ئیتستا یەکیکە لہ شاعیر و ئەدیبە ھەرە
بەناوبانگەکانى کوردستانە.

بەرزنجی، وەها باسی کەشى ناو قوتابخانەکە دەکات
و دەلێت؛ قوتایبەکان لہ کورسیەکان زۆرتر بوون، ئەمەش
ئامازەبە بۆ بچووکی قوتابخانەکە و گەورەبى و ئاوەدانى
گوندەکە.

بەلام ھێرشى سوپای عیراق نەبەیتشت ژمارەى
کورسییەکانى قوتابخانەکە زۆر بن و، ھەر ئەم ھێرشە وایکرد

سۆڤۆڤ



”کە ئاور لہ ژيانم دەدەمەوہ، دەزانم لہو کاتەى
لەدایکبووم ژيانم بە ھیلێکی راستدا نەپۆشتووہ. بۆ
پیشەوہ ھەنگام ناوہ، بۆ دواوہ گەرامەتەوہ! داگیرکەران
نەیانھێشتووہ لہ زیدی خۆم بە ئارامى جیگیر بى، ئەمەشە
وایکردووہ چیرۆکەکانم وەک ژيانم پارچە پارچە بن و
نزیک بى لەوہى گۆر غەریبىش بى!“ جەلال بەرزنجی
وہا باسى ژيانى خۆى دەکات.

ئەو؛ لہ گوندیک لہ دایکبووہ کە شەش سەت سأل
تەمەنیەتى، کەچی تا ئەو کاتەى جەلال بەرزنجی شاعیر
تەمەنى دەگاتە ھەوت سألان ھیشتا قوتابخانەى لى
نەبووہ، تەنانەت یەک دانە کتیبىش لہو گوندە نەبووہ
جگە لہ کۆپى قورئان کە ئەویش لہ مژگەوتى گوندەکەدا
بووہ، ئەمەش بە دیوہکەى دیکە ئەوہ پشتراست دەکاتەوہ
ھەموو گوندیکى کوردستان ئەگەر تەنیا سى مأل بوو
بیت ئەو مژگەوتیکى لى بووہ و، حوجرەى مژگەوتەکانیش
یەکەمین قوتابخانە بوونە!

کاتیک دەزانیت لہگەل براکەى جمک نین، بەلام

گوتهشی: "له كهرنهفاله گهورهكهى نهوررۆزى كۆلن، ياداشتنامهيهك بۆ راي گشتى و گهلانى نهورروپا و دامهزراوه فهرميهكانى نمو و لاتانه دهخويندريتهوه، تيبدا داواى چهساندى مافى كورد له دهستورى نوئى سووريا دهكرت."

ناهنگهكه بووه جىي سهرنجى خهلك و ميدياى بيانى

زياتر له 50 ههزار كوردى دياسپورا بهشداريان له ناهنگهكهى كۆلن كرد و بووه جىي سهرسامى ميديا و دامهزراوه ئەمنيهكانى ئەلمانيا، كه ناهنگىكى وا گهوره و فراوان، به ئارامى و خوئشى و بى هيج رووداوىكى نهخوازارا سهركهوتوانه كۆتايى پى هات، بهمەش نمونهيهكى جوانيان پيشانى ههموو جيهان دا و دووپاتيان كردهوه، كه كورد گهليكه حەز به نازادى، ژيان و مرفؤدۆستى دهكات.

لهوبارهوه رۆژنامهى (wdr)ى ئەلمانى گوتى: "پۆليس پيشبىنى نهدهكرد نمو ژماره زۆرهى خهلك بهشدارى بكهن، بهلام ناهنگهكه بهبى كيشه و ئارامى بهپرتوه چوو."

(Dw)ى ئەلمانى له راپۆرتيكيذا تيشكى خسته سهر ئەوهى: "ناهنگى نهوررۆز به بهشدارى مليۆنان كورد له تهواوى جيهان بهپرتوه چوو و جهژنهكهيان پيرۆز كرد، نهوررۆزى ئەمسال چيۆيكي تايهتى ههبوو."

ههرچى (تى ئۆنلاين)ى ئەلمانييه سهبارت به نهوررۆز و ناهنگ گوتى: "نهوررۆزى ئەمسال مانايهكى گهورهترى بۆ كورد ههيه، چونكه پزىمى ئەسهد پروخواه، ههولەكانى پروسەى ناشتى له توركي دهستيان پىكردوووه و هيوايهك ههيه كورد له توركي و سووريا مافهكانيان بهدهست بهيئن." ■



كۆنفيدراسيۆنى رهوهندى كوردستانى، سهبارت به بهپرتوهچونى ناهنگى شارى كۆلن بۆ ميدياكان پراگهياندا: "سالانه ناهنگى نهوررۆز له و لاتانى نهورروپا بهپرتوه دهچن و كوردانى دياسپوراي ههر چوار پارچهى كوردستان به پشتيوانى كۆنفيدراسيۆنى رهوهندى كوردستانى، به شايى و ههلهپركى و ميوزيك و گۆرائى كوردى ناهنگهكان بهپرتوه دهبن، بۆ ئەمسالىش، ناهنگى فراوانى نهوررۆز بۆ پشتگيرى له پزۆئاواى كوردستان، له شارى كۆلنى ئەلمانيا بهپرتوه دهچيت."

لهگهڵ خهباتى نهپساوهى گهلى كوردستان بۆ نازادى و سهربهخۆيى نوئى دهكهنهوه. گوتهشى: "نهوررۆزى ئەمسال ههر تهنيا جهژن نييه، بهلكوو هاوسۆزى و پشتيوانيه له رۆژئاواى كوردستان."

سهرپهرشتياري گشتىي رهوهندى كوردستانى رايشى گهياندا: "تيمه هاوبهشى خوئشى و ناخوشيهكانى گهلى خۆمانين له ههر چوار پارچهى كوردستان، دروشمى ئەم سالى ناهنگى نهوررۆز (شان به شان و دل به دل سهرپهرشتياري گشتىي رهوهندى كوردستانى رايشى گهياندا: "تيمه هاوبهشى خوئشى و ناخوشيهكانى گهلى خۆمانين له ههر چوار پارچهى كوردستان، دروشمى ئەم سالى ناهنگى نهوررۆز (شان به شان و دل به دل

پهيامهكانى نهوررۆزى كۆلن پشتگيرى بوون له پزۆئاواى كوردستان

ههرمن ئەحمەد، بهرپرسي ئۆفيسي پراگهياندى



**“كوردم و كوردستانيم” دهنگى دليرى كوردان بوو
له ئاههنگى كۆلن**

كوردانى دياسپورا له شارى كۆلن له ئەلمانيا به همموو دهنگ و رهنگهكان له 22ى ئادار بوو ئاههنگهگيران كۆ بوونهوه و به شايى و ههلهپهركى و به گوتهوهى “كوردم و كوردستانيم” دهنگى خۆيان به تهواوى جيهان گهياند و پشتگيرى خۆيشيان بوو رۆژئاواى كوردستان دهپرئ، تاوهكوو مافه رهواكانى له دهستورى سوور يادا بچهسپين.

دهنگ و رهنگى راستهقىنهى بهشدار بوان پريگهى بهوه نهدا ئهو ههولانه سهر بگرن و لهو ئاههنگهدا پريازى دلستزى بوو لات و كوردستانىيون سهر كهوت.

سهرپهرشتيارى گشتى پوههندى كوردستانى، سلاوى گهرمى سهرۆك بارزانى به كوردستانىيانى دياسپورا گهياند و له وتهيهكيدا گوتهى: “دهمهويت سلاوى گهرمى سهرۆك و پيشمهركه و پاريزهري كوردستان،



شيفا بارزانى، سهرپهرشتيارى گشتى پوههندى كوردستانى، له ئاههنگه جهماويهكهى كۆلن رايگهياند، لهكاتيكدا ئهوان له دوورى و لات ناگرى نهورۆز دهكهنهوه، تهنيا جهژنى نهورۆز پيرۆز ناكهن، بهلكوو پهيوهندييهكان له نتيوان خۆيان و كولتور و ميژوو و نيشتمان نوئ دهكهنهوه، پهيوهنديى خۆيان

(سهرۆك مهسعود بارزانى) تان پى را بگهيهنم، سهرۆك بارزانى نهورۆزى ههموان پيرۆز دهكات و زۆر دلخۆشه بهو گردبوونهوه گهرهى ئيوهى كوردستانىيان له كۆلنى ئەلمانيا، دلخۆشه به يهكگرتن و براهيتى و خۆشهويستى نتيوان كوردستانىيان له ههر چوار پارچهى كوردستان.





نهورۆزی كۆلن

نهورۆزی پشتگيری له رۆژئاوای كوردستان

رۆژێك



جۆش و خرۆشێکی بێ وینه بهشداریان له ئاههنگی نهورۆز له شاری (كۆلن) ئهلمانيا كرد. بهشداري ئهو ژماره زۆری كوردستانيانی خۆشهويست و شوێنكهوتوانی رێيازی كوردايهتی و نيشتمانپهروهري لهم گردهبوونهوهيدا، ئاماژهیهکی پروونه بۆ توانا و زیندوووتی پوهندی كوردی لهدهرهوهی وڵات و سهلمیتهری ئهوهشه، كه رۆلهكانی گهلهكهمان لهدهرهوهی وڵات، هێزێکی گهوره و ههمیشه ئامادهن بۆ پالپشتیکردنی دۆزی پهوای گهلی كوردستان له ناوهنده جیهانییهكان و لهناوای گشتی جیهانیدا.

سهروك له پهيامهكهيدا، كه شيفا بارزانی خويندیهوه، جهختی له سهركهوتنی رێيازی دلسۆزی بۆ وڵات و كوردستانیبون كردهوهوه و ئاماژهی كردهبوو بۆ: ”ههرچنده له ئاههنگهكهی شاری كۆلن دهستیکی نائهمین ههولێ تیکدان و نانهوهی ئازاوهی دا و له پروومالکردندا ویستیان پهيامی گردهبوونهوه جهمارهیهكهی نهورۆزی (كۆلن) بهلاریدا بیهن، بهلام

كوردستانيان له ههر كۆیهك بن، ههموو سالتیک له (21 ی 3)، به بۆنهی جهژنی نهورۆزی نهتهوهیی كورد و سهری سالی نوێی كوردی جهژن و ئاههنگ ئهگپن، بهلام نهورۆزی ئهمسال زۆر جیاواز بوو، بهتایهت كوردانی دیاسپۆرا له شاری كۆلن له ئهلمانيا، به ئاههنگیکی جهمارهویی بێ وینه، نهورۆزێکیان پیرۆز كرد، پینشر نمونهی نهبووه و کردیان به نهورۆزی پشتگيری كورد له رۆژئاوای كوردستان بۆ چهسپاندنی مافه پهواکانی له دهستووری سووریاى دواى رژیمی ئهسهد.

وتاری سهروك بارزانی، جۆش و خرۆشی زیاتری به ئاههنگی كۆلن بهخشی

سهروك مهسعود بارزانی، پهيامیکی تايهت و میژوویی بۆ ئاههنگگپرانی كورد له كۆلن نارد و پهيامهكه لهلایهن شيفا بارزانی، سهرپهرشتیاری گشتی پوهندی كوردستانی خويندرايهوه، كه تيايدا هاتبوو: ”جیگهی خۆشحالییه، ژمارهیهکی زۆری هاوولاتیانی كورد، به



پروژه‌ی به‌بریتیه له دایینکردنی کاره‌بای ۲۴ کاتمیتری بۆ هه‌موو شار، شارۆچکه و گونده‌کانی هه‌ریمی کوردستان تا کۆتایی سالی ۲۰۲۶.

پیش ده‌ستپیکردنی پروژه‌ی رووناکی، کاره‌بای ۲۴ کاتمیتری له بازاری له‌نگه‌ی هه‌ولیر و بازاری دهۆک و چه‌ندین سیتی و پروژه‌ی نیشته‌جیبون له ڕینگه‌ی پروژه‌ی پریه‌یدی کاره‌بای ۲۴ کاتمیتری، جیبه‌جی کرابوو.

وه‌زاره‌تی کاره‌با رایگه‌یانده‌وه، ئیستا ئاستی به‌رهمه‌پێانی کاره‌با له‌نیوان ۳۲۰۰ بۆ ۳۵۰۰ میگاواته و خواستیش بۆ ۴۰۰۰ تاوه‌کو ۴۵۰۰ به‌رز بووه‌ته‌وه، له وه‌زی زستانیش خواست بۆ پری ۶۵۰۰ تاوه‌کو ۷۰۰۰ میگاوات زیاد ده‌ییت.

وه‌زاره‌تی کاره‌با پێنویه به‌هۆی ئه‌و پروژه‌یه‌وه هاوولاتیان که‌متر کاره‌با به‌کارده‌هێنن و ئه‌مه‌ش واده‌کات، ئه‌و پری هه‌یه به‌دادگه‌ری به‌شی هه‌موو کوردستان بکات. هه‌روه‌ها ئه‌گه‌ر مانگانه پاره‌ی کاره‌با کۆبکرتنه‌وه، ده‌توانی ئاستی به‌رهمه‌پێان هه‌شتا زیاد بکری.

به‌پێی راگه‌یه‌ندراوی وه‌زاره‌ت، تاوه‌کو روژی ۸ی ئاداری ۲۰۲۵، له ۲۱ گه‌ره‌کی هه‌ولیر و ۱۲ گه‌ره‌کی سلیمانی، زیاتر له ۱۰۰ هه‌زار هاوبه‌شی کاره‌با، سوودمه‌ند بوون له پروژه‌ی رووناکی و ”له‌ ماوه‌یه‌کی نزیکیش“ دا، یه‌که‌م گه‌ره‌کی شاری دهۆکیش کاره‌باکه‌ی ده‌ییته ۲۴ کاتمیتری. ■

پروژهی رووناکی رووناکردنهوهی ژيانی هاوولاتییان

پروژهی رووناکی وهک شارهزایان باسی دهکهن، سوودی زۆری بۆ هاوولاتییان له روی دارایی، ژینگه و تهندروستیهوه دهییت، بهشپهیهک:

سۆڤد



- ژینگه له دوکهلێ مۆلیدهکان پاک دهییتهوه.

- ژاوه ژاوی مۆلیدهکان نامییت.

- بارگرانی لهسهر پێدانی دوو نرخێ کارهبا (کارهباى مۆلیده و کارهباى نیشتمانی) لهسهر شانی هاوولاتی نامییت.

- مهترسیی بۆبوونهوهی نهخۆشیی مهترسیداری وهک شپیرهنجه بههۆی دوکلهوه نامییت.

روژی ۱۲ ی ئاداری ۲۰۲۵، وهزارهتی کارهباى حکومهتی ههریمی کوردستان له پهیجی فهرمیی خۆیدا رایگهیاندا، بههۆی پروژهی رووناکییهوه، نزیکهی ۴۰۰ مۆلیدهی ئەهلێ له گهپهکهکانی شاری ههولێر کوژێنراونهتهوه، که کاریگهریی کوژاندنهوهی ئەو ۴۰۰ مۆلیده ئەهلیهش لهسهر ژینگه، هاوشپهیهی نههیشتی ۶۰ ههزار بارهههلهگره لهسهر شهقامهکان.

له دوای راپهڕینی ئاداری ۱۹۹۱ هه داخوازیی بهرهوامی خهلهکی کوردستان بوونی کارهباى بهرهوامه هاوشپهیهی ولاته پێشکهوتوهوهکان و پلانی دانراو بۆ ئەو

حکومهتی ههریمی کوردستان له رتی پروژهیهکهوه بهرهو دایینکردنی کارهباى بهرهوام بۆ ههموو شار و شارۆچکهکانی کوردستان، ههنگاو دهییت.

روژی ۱۷/۱۰/۲۰۲۴، مهسرور بارزانی، سهروکی حکومهتی ههریمی کوردستان له شاری ههولێر، پروژهی (رووناکی) راگهیاندا، که برتییه له بهکارهتینانی کهمترین پر کارهبا له لایهن هاوولاتییانهوه و ئامانج لێی دایینکردنی کارهباى ۲۴ کاترمیتریه بۆ ههموو کوردستان.

له ههریمی کوردستان، یهک ملیۆن و ۹۰۰ ههزار هاوبهشی کارهبا ههن، لهو ژمارهیه یهک ملیۆن و 345 ههزار و ۸۹ هاوبهش پتوهری زیرهکییان بهستوه، تهنیا له کابینهی نۆیهمی حکومهتی ههریمی کوردستاندا ۴۳۶ ههزار و ۹۸۱ هاوبهش زیاد بوون و ههر هاوبهشیکیش پتوهری زیرهکی بۆ بهستراییت، پروژهی کارهباى 24 کاترمیتریه دهیگرتهوه.

شاندى كۆنفيدراسيۆنى رەۋەندى كوردستانى لەگەل سەرۆك بارزانى كۆدەبىتەۋە

سەرۆك بارزانى ھەرۋەھا پىشۋازى لە سياسەتى كارکردنى كۆنفيدراسيۆن كورد.

سەردانى چەند شوپىتىكى گزنگى ھەرىمى كوردستان

پاش ديدار لەگەل سەرۆك بارزانى، شاندى كۆنفيدراسيۆن سەردانى چەند شوپىتىك و دامەزراۋەيەكى گزنگى ھەرىمى كوردستانى كورد، كە برىتى بوون لە:

رەۋەند



شاندى كۆنفيدراسيۆنى رەۋەندى كوردستانى سەردانى ھەرىمى كوردستان دەكات

پژۋى سېشەممە، ۴ى ئادارى ۲۰۲۵، شاندى كۆنفيدراسيۆنى رەۋەندى كوردستانى بە سەرپەرشتى شىفا بارزانى، سەرپەرشتى گشتى كۆنفيدراسيۆن بە مەبەستى بەھىزکردنى پەيوەندىيەكانى كۆنفيدراسيۆن و ھەرىمى كوردستان و گفتوگو لەسەر كار و چالاكى و گۆرانكارىيە سياسىيەكانى ناۋچەكە، گەشتىكى دىپلۇماسىيە سەرکەوتتورى بۇ ھەرىمى كوردستان كورد.

ديدار لەگەل سەرۆك مەسعود بارزانى

شاندى كۆنفيدراسيۆن لە يەكەم چالاكىيە سەردانەكەيدا، ديدارىكى لەگەل سەرۆك مەسعود بارزانى كورد. سەرۆك بارزانى تيشكى خستە سەر چالاكىيەكانى كۆنفيدراسيۆن و پۇلى گزنگى لە پروسەي ئاشتى لە باكورى كوردستان و گۆرانكارىيەكانى پۇژئاۋاي كوردستان و سووريا.

- مەزاري نەمران، كە مەزاري مستەفا بارزانى، رېھرى شۆپشى رزگاربخوازي گەلى كوردستانە و شوپىتىكى گزنگ و پۇچىيە بۇخەلكى كوردستان.

- پەرلەمانى كوردستان، لەوسەردانەدا گفتوگوپەكى كارىگەر لەسەر سياسەت و ياساكانى ھەرىمى كوردستان كورد.

- مەكتەبى پەيوەندىيەكانى پارتى ديموكراتى كوردستان، ھەرۋەھا سەردانى دەفتەرى سياسىيە حزبى ديموكراتى كوردستانى ئيران: شاندىكە لەگەل مستەفا ھىجرى، سكرتيرى حزبى ديموكرات كۆ بوۋەۋە.

واژۇکردنى ياداشتىكى ليكتىگەيشتى پەروەردەيى گزنگ

لە كۆتايى گەشتەكەدا، شاندى كۆنفيدراسيۆن ياداشتىكى ليكتىگەيشتى لەگەل ۋەزارەتى پەروەردەيى حكومەتى ھەرىمى كوردستان واژۇ كورد. ياداشتەكە بە مەبەستى بەھىزکردنى ھاۋكارىيەكانى ئىۋان ھەردوۋلا و پەرەپىندانى

پەروەردە و زانست و كوردنەۋەي پۇلى ئۇنلاين بۇ خويىندى زمانى كوردى بۇ كوردانى دەروەۋى ھەرىمى كوردستان، واژۇ كورد.

لە مەراسىمى واژۇکردنى ليكتىگەيشتەكەدا، شاندى كۆنفيدراسيۆن بە سەرپەرشتى شىفا بارزانى و كۆمىتەي بەرپەرشتى كۆنفيدراسيۆن ئامادەبوون، كە برىتى بوون لە:

- ئىسماعىل كامال: سەرۆكى كۆنفيدراسيۆن
- شەرمين پۇژنەرسەلان: بەرپرسى ئۇفيسى پرىكخستن
- شوكرى بەروارى: بەرپرسى ئۇفيسى دارايى
- رەھىم رەشىدى: بەرپرسى ئۇفيسى پەيوەندىيەكان
- نۆشىن مېشۇ: بەرپرسى ئۇفيسى زمانى كوردى
- ۋەزىر كتيار: بەرپرسى ئۇفيسى كاروبارى يەكتىبى سۇفەتى پىشۋو
- كۇقان ئامىدى: بەرپرسى ئۇفيسى ياسا
- زازا كەلاشۇف: بەرپرسى ئۇفيسى لاۋان
- ھەرمەن ئەحمەد: بەرپرسى ئۇفيسى راگەياندىن ■





نویسته‌ی به شیوه‌زاروو هۆرامی و کاریگهریش
جه ئارۆو ئه‌ده‌بیاتو کوردییه‌نه

45-44 وه‌رزشوانیکی گه‌نجی کورد له‌ ئینگلترا به‌ره‌و یاریکردن له‌ ئۆلۆمپیاد ده‌چیت	7-6 شانسی کۆنفیدراسیۆنی ره‌وه‌ندی کوردستانی له‌گه‌ڵ سه‌رۆک بارزانی کۆده‌بیته‌وه
49-46 سه‌رباز به‌رزنجی: وه‌ک شانازی به‌ کولتوری گه‌له‌که‌مان به‌ جلی کوردی و زمانی کوردی سویندی یاساییم خوارد	9-8 پڕۆژه‌ی رووناکی رووناککردنه‌وه‌ی ژبانی هاوڵاتیان
55-51 هونه‌رمه‌ندیکی کورد، عه‌ره‌ب به‌ کاره‌ هونه‌رییه‌کانی سه‌رسام ده‌کات	17-10 نه‌ورۆزی کۆن نه‌ورۆزی پشتگیری له‌ رۆژئاوای کوردستان
59-56 گه‌نجیکی کورد له‌نیوان بازنه‌ی فۆتۆگرافی و فلیمسازیدا بووه‌ته‌ که‌سیکی جیهانی	23-18 جه‌لال به‌رزنجی له‌ گوندی ئه‌شکه‌وت سه‌قاوه یۆ لوتکه‌ی ئه‌ده‌بی جیهانی!
63-60 ره‌نگاله	27-24 تێروانینیکی سۆشه‌ڵ سایکۆلۆژیانه‌ له‌مه‌ر به‌کاره‌ینانی مادده‌ هۆشبه‌ره‌کان له‌ نیو گه‌نجادا
67-64 شیفا بارزانی به‌شداریی کۆبوونه‌وه‌ی ریک‌خراویکی کوردی پارتی کرێکارانی به‌ریتانیا ده‌کات	31-28 نویسته‌ی به‌ شیوه‌زاروو هۆرامی و کاریگهریش جه ئارۆو ئه‌ده‌بیاتو کوردییه‌نه
73-68 ناسیونالیزمی دوورمه‌ودا، دیاسپۆرا، جیهانی دیجیتاڵ	33-32 نه‌جمه‌دین غۆلامی: له‌ هه‌نده‌ران هه‌ستی نه‌ته‌وه‌یی زیاد ده‌کات
77-74 گۆنا ماجید عیزه‌ت به‌گ... خانمیکی کوردی باشوور ده‌بیته‌ ئه‌ندامی ئه‌نجومه‌نی وزه‌ی ئۆنتاریۆ	37-34 سه‌رساڵ ئافراندا کنیا و سروش و به‌ده‌وی یه
79-78 خاک و گه‌رانه‌وه	43-38 کورتبه‌سیک له‌سه‌ر جه‌ژنی نه‌ته‌وه‌یی بیژن دانا

دیزاین ئاراس ئەکرهم	سه‌رنووسه‌ر هه‌رمه‌ن ئەحمه‌د	خاون ئیمتیاز کۆنفیدراسیۆنی ره‌وه‌ندی کوردستانی
ده‌سته‌ی نووسه‌ران هه‌رمه‌ن خالید، مه‌ولوود ئۆغوز	په‌یوه‌ندییه‌کان هه‌ورامان عه‌لی تۆفیق	

نەورۆز.. سەمبولی پیرۆز و خالی هاوبەش و یەکبوونی کورد



هەرمەن ئەحمەد
سەرنووسەر

سەرەرای ئەو هەموو نەهەمەتی و تەفرۆتووناکردن و کۆمەڵکۆژی و خاکسوتان و مائۆرانکردنە دوژمنانی کورد بەسەر کوردیاندا هیناوه، سەرەرای هەزاران ساڵ لە هەولێ پاكتاوکردن و نەهێشتنی نەژادی کورد لەلایەن هەموو داگیرکارەکانی کوردستان لە مێژوودا، سەرەرای ئەوەی لە هەندێ قۆناغی تاریکی مێژوودا بە سەدان ساڵ، ئامانجی گەورە و لەپیشینە نەیارانی کورد، نەهێشتنی (هەستی کوردبوون) بوو، زمان و نووسینی کوردی قەدەغە بوو و سزاکی مەرگ بوو، سەرەرای ئەوەی تا ئێستا کە سەدەییست و یەکە، بەشی هەرەزۆری خاکی پیرۆزی کوردستانی مەزن، لەبەن دەستی داگیرکارانی دژە کورددا، لێ بە خۆشحالییەوه، کورد ماوه، کورد بە زمان و فەرھەنگ و بوون و ھیزی بەرگرییەوه ماوه.

زۆر لە گەلانی دنیا هەن کە کەمتر لە کورد و کوردستان، کارەسات و ھەشووھەمی داگیرکاری رووی تێ کردوون، بەو مەرجە داگیرکارانی ئەو گەلانە، ھێچیان ھەکوو داگیرکارانی کوردستان، دێندە و نامرۆف و پۆخل و تاوانبار و خۆپێژ نەبوون، کەچی زۆر لەو گەلانە توانوون ئەوە و ھەندیکیان زمانەکانیان بۆ ئەبەد لەنتیو مرقایەتیدا نەماوه، ھەندیکیان جوگرافیای خاکیان نەما، ھەندیکیان ھەر خودی گەلەکان توانوون ئەوە، نەسل و نەوھەیکیان نەماوه کە ھەست بکات سەر بەو نەتەوھەییە، مێژووێکیان تەنیا ھەک تیکستیک بوو تەبابەتی سەر لاپەرەکان، یان ھەک سەربەدەیک باسیان لێو دەکرێت و بەس، نە بۆنەیان، نە زمانیان، نە جەژنیان، نە بیروباوەریان، نە گۆرانییان نە موزیکیان، نە نەریتیان، نە فەرھەنگیان ھێچیان لەمانە نەماوه.

بەلام بەخۆشحالییەوه کورد یەکیک نە لەو گەل و نەتەوانە، بەلکۆو ھەک لە سەرەتاوھ باسەم کرد، وێرای ئەو هەموو تاوانە گەورەییە لەلایەن دێندەترین داگیرکارانی مێژووی مرقایەتییەوه لەدژی کورد ئەنجام دراوون، کورد ھەر ماوه، راستە ئازاری گەورەیی پێ گەشتووه، سەتەمی گەورەیی دەرھەق کراوه، خۆینی زۆری لێ چۆراوه، دەر بەدەر بوو، ئاوارە بوو، پەنا بەر بوو، لێ کورد و زمان و فەرھەنگەکی ماون، جەژن و بۆنەکانی ماون و تا ئێستا بایەخیان پێدەدات و ساڵ بە ساڵیش ئەم بایەخە بە مانەوێ خۆی و فەرھەنگەکی زیاتر دەبێت. ئێجا یەکیک لەو لایەنە گەنگانە کۆلتووور و باوەر و مێژووی کورد کە ھەزاران ساڵ بە زیندوویی ماوھتەوه، جەژنی نەورۆزی کوردانە.

رەنگە لەلایەن ئازادبوونی خاکیکی فراوانی باشووری کوردستان لە داگیرکەر و ھەرەھا نیمچە ئازادبوونیکێ روژئاوای کوردستان، لەلایەکی تریشەوه ئەستوووربوونی دیواری سەتەم لە بەشەکانی تری کوردستان، ئەم دوو فاکتەرە روژی کارایان ھەبێت لە گەشەسەندن و پەرەسەندنی جۆر و شێوازی بایەخدان بە جەژنی نەورۆز، دەبیین، ساڵ بە ساڵ تەنانت لەسەر ئاستی جیھانیش، ئەم جەژنە زیاتر دەبێتە ناسنامە کورد و کوردستانیان لە ھەموو دنیا، ساڵ لەدوای ساڵ نەورۆز لە باشوور و نەورۆز لە باکوور و روژھەلات و روژئاوای کوردستان و لە تاراوگەش، مەزنتەر و رێدارانەتر دەکرێتەوه.

ئاخر نەورۆز ھەم جەژنی پیرۆزی نەتەوھەیی و نیشتمانی و کۆلتووویی ھەزاران ساڵی کوردی زاگرۆسنشین و خودان شارستانییەتی مەزنە، ھەمیش سەری ساڵی کوردییە، رەنگە ھەموو ئەوانە زانراو بێت، بەلام ھەز ئەکەم روونی بکەمەوه کە بۆچی نەورۆز، ئەک لەنتیو خاکی کوردستان، بەلکۆو لەنتیو کوردانی تاراوگەشدا تا دیت پەرە دەستێتی؟ بۆچی لەنتیو ئەم ھەموو گێژاو و مەملانی و شەر و کاولکارییە ناوچەکاندا، مرقوی کورد ھەر کە لە کۆتایی زستان نزیک دەبێتەوه، ئیدی جۆرێک دڵخۆش و نەشەیی نەتەوھەیی دەیگرێ و ئیدی زیاتر ھەز بە بینینی ئاگر دەکات و دڵخۆش دەبێ و ھەز بە دەشتوودەر و کەزوکێو دەکات و چاوەرێی روژی ٢٠ ساڵ ئادار دەبێت تا ئاگرە بکاتەوه شایی و ھەلپەرکێ و سەریان دا بەستیت؟

بە رای من، چەند ھۆکاریکی زۆر گەنگ ھەن کە بوونەتە فاکتەرگەلێکی دیار و بەھیز و پتەو بۆ بەردەوامیی نەورۆز و پەرەسەندنی نەورۆز، کە مەبەستەم لەم شوینی سەروتاری ئەم گۆفارە شیرینەدا و لەم مانگە پیرۆز و جوانی کورداندا ئاماژەیان پێ بکەم، کە لەم خالانەیی خوارەویدا پوختیان دەکەمەوه:

یەکەم: قوولی و دێرینی رەگوریشە جەژنی نەورۆز لەنتیو فەرھەنگ و مێژووی ھەزاران ساڵی کورد و کوردستاندا.

دووەم: پیرۆزی ئاگر لەنتیو میتۆلۆژیای کورد و ئاینە کۆنەکانی کورددا، لەو کاتە کە ئاگر یەکەمین و سەرەکیترین سیمبۆلی نەورۆزە.

سێیم: زیەکی وردی و رۆدی و عاقلمەندی ئەو کەسە کە یەکەمین جار، سالنامە کوردیی دانا و بەستییەوه بە دامەزراندنی دەولەت یان ئیمپراتوریای مادی کوردان و لە روژی نەورۆزیشدا، بە داوای لێبوردنەوه نازانم کێ، بەلام ھەر کەسێک بێت، گۆری رۆشن و رۆحی شاد و ئارام بێت.

چوارەم: لە ھەموو فاکتەرەکان گەنگتر ئەوەیە کە کوردی ھەر چوار بەشی کوردستانی مەزن و کوردی ھەموو دنیا، لەسەر جەژنی نەورۆز کۆکن، واتە کورد لە ھەر شوینیکی دنیا بێت، نەورۆز بە جەژنی نەتەوھەیی و مێژوویی خۆی دەزانی، جا ئاھەنگی بۆ بگێرێت یان نا، ئەوەیان گەنگ نە، گەنگ ئەوەیە باوەری بەو ھەبە کە (نەورۆز جەژنیکی کۆنی کوردە) ھەک پیرەمێردی شاعیری مەزنی کورد دەبێت. واتە نەورۆز خالی ھاوبەشی ھەموو کوردە، بە جیاوایی ئایدۆلۆژیای ئینتیمای حزبی و ناوچەیی جوگرافیایەوه، واتە کوردێک لە تاجاکیستان و کوردێک لە لوپنان و کوردێک لە روسیا و کوردێک لە ئەمریکا و کوردێک لە ئەلمانیا و سوید و کوردێک لە خوراسان و کوردێک لە ئیسرایلیش بێت، ھەک کوردانی ھەر چوار بەشی کوردستان، جەژنی نەورۆز دەگێرێت، کوردێک مۆسڵمانیکێ کوردانە بێت، جا شیعی بێت یان سوننە، کوردێک ئیزیدی بێت، کوردێک زەردەشتی یان کاکەیی یان مێترایی یان کریستیان یان جوو یاخود ییدینیش بێت، بە ھەر شێوەزاریکی کوردی بدوێ و بنووسیت تەنانت ئەگەر کورد بێت و کوردیش نەزانی، ھەر بە بایەخ و رێزەوه جەژنی نەورۆز بە جەژنی نەتەوھەیی و نیشتمانی ھەر گەورەیی خۆی دەزانی.

پنجەم: ھەک چۆن جەژنی نەورۆز بوو تە خالی ھاوبەش و لەسەر رێککەوتووی ھەموو کورد و کوردستانیان لە ھەموو دنیا، ئاواش بوو تە خالی جیاکەرەوه مان لە گەلانی تر، چونکە گەلانی دیکەش جەژن و بۆنە و پیرۆزی و سیمبۆلی خۆیان ھەبە و ئیمەش نەورۆزمان ھەبە.

شەشەم: دواخالی ئەوەیە، مادام دوژمنان و داگیرکارانی خاکی کورد، مادام ناپاک و خۆفروش و عەقڵ داگیرکارەکانی ناوختومان، پێیان ناخۆشە بایەخ بە جەژنی نەورۆز بدەن و بە پیرۆزی لێی بپروائین، کەواتە دەبێ ھەموومان بزائین کە بایەخدان بە جەژنی نەورۆز، یەکیکە لەو رێگایانە کە لە سەر بەخۆیی و ئازادی یەکجارەکی و سەرورەیی نەتەوھەیی و نیشتمانی نزیکمان دەخاتەوه.

جەژنی نەورۆز و سەری ساڵی کوردی لە ھەموو کورد و کوردستانی پیرۆز بێت سەرفراز بێت گەلی کوردستان، سەرکەوتوو بێت کوردستانی خۆشەویستمان، شەکاوه بێت ئالا بەرز و رەنگینە کەمان... ■

دیمه‌نیکی کارکردن له پروژه‌ی دووسایدی هه‌ولیر - کۆبه

